Azadiya
# WELAT

Rojnameya Hefteyî

17


SAL: 1

12 - 18 Gulan 1996

BUHA: 50.000 TL

AHMET ALTAN:

# Ne însanên bêerd yên bêaqil birçî dimînin



Wêne: Düzgün Deniz

Vêga ji PKK'ê re tiştekî ku ez bibêjim zêde nîn e. Ancax dikarim ji dewleta tirk re bibêjim. Çima? Ez xwediyekî dewleta tirk im. Ez dikarim jê re bibêjim ku, "Dixwazim li vî welatî aştî hebe, demokrasî û hiqûq hebe." Lê ezê ji PKK'ê re çi bibêjim? Çi têkiliya min heye pê re? Ji PKK'ê re "Di nav hiqûqê de bilive" ezê bibêjim? Kîjan hiqûq? Armanca me ya tevan ew e ku zarokên me baş bijîn.

● Êdî pereyê belaş jî neman. Maliyeya dewletê hilweşiya. Dewlet nikare ji memûrên xwe re meaşan jî peyde bike. Êdî gelê tirk mîna ku serê xwe li dîwêr bide, serê xwe li rastiyê, bi leza 160 km. wê bide û wê rastiyê bibîne; ev sîstem xelas bû.

*Rûpel 8–9*


✓ **Amerîka ji ber gelşa kurdan û Filistînê ketiye tengasiyê nûçeya** SAMÎ BERBANG **"Kilîda Rojhilata Navîn kêşeya kurd e"** *Rûpel 3*

✓ **Di warê qiyafetan de jî çanda me zengîn e.** XELEF ZINARÎN **îcar "cil û bergên herema Culemergê" dide nasandin** *Rûpel 4–5*

✓ **"Hawarek ji kurdên dûrxistî",** ZANA FARQÎNÎ **bi vî navî behsa dema derxistina "Hawar"ê dike, ku 64 sal berê di 15'ê gulanê de dest bi weşanê kiribû** *Rûpel 10*


✓ **"Şûrê melkemotê kulê têrxwîn nedibû..."** RAHMÎ BATUR **"Şeva Çaran", kuştina İbrahim Kaypakkaya, Hakî Karer û Halil Çavgun bi bîr tîne** *Rupel 16*

## NAVEROK



6

Î. Omerî: Serencama çûçikên Apê Mûsa



7

Düzgün Deniz: Ji Koma Agirê Jiyan kaseteke nû



11

Metin Aksoy: Lehengan li Çiyayê Agirî dîrok nivîsîn lê...

## Ji Xwendevanan

*HIN pêşniyazên min ji parlementoya me ya li Derveyî Welat re hene:*

*1) Divê saziyên navendî û neteweyî yên ku li ser ziman xebat bike werin avakirin. Wekî saziya ziman, nifûs, îstatîstîk û hwd.*

*2) Navên ku dagirkeran li me danîne gere em ji wan nav û paşnavan dest berdin.*

*Ma qey ev nav û paşnav Xwedê li me kirine? Gere her kurdek xwedî nav û paşnavekî kurdî be.*

MENDO MOBAR
STENBOL

*EZ xwendevanekî we me. Heta beriya çendekî îmkanên me tune bû ku em rojnameya xwe bixwînin. Lê belê nêzîkî çar (4) mehan e ku ez bi şeklekî sîstematîk dixwînim. Xaçepirsa we bala min kişand. Û min û du hevalên xwe me peyva veşarî di sê deqîqeyan de derxist.*

*Bi rastî ji bo ku rojname were xwendin ez û hevalên xwe em pir dixebitin. Ji ber ku pêşvebirina zimanê me, xwendin û nivîsandina zimanê me pir pêwist e. Bi vê hêviyê, em di jiyana we ya weşanê de serkeftin dixwazin û cardin silav û hurmetên xwe ji we re pêşkêş dikin.*

OSMAN BOR
KUŞADASI/AYDIN

# Parastin û hêvişandin

MEHMET GEMSİZ

Tiştin hene ku têne hêvişandin, lê nayên parastin. Tiştin jî hene ku hem têne hêvişandin û hem jî têne parastin. Carinan, em bi zanebûn di nav rûpelên rojnameya xwe de cih ji van tiştan re vediqetînin. Bi piranî jî, di warê zargotin û pêkenokan de. Jixwe ev yek eşkere tê dîtin.

Di weşandina wan de mebest û armancên me hene. Her çiqas em bi xwe jî wan neecibînin û neparêzin jî, em dixwazin wan bihêvişînin (muhafeze bikin), ji ber ku di wan de bîr û baweriyek heye. Ew, awayê kenîn û girîna gelê me, karaktere civaka me, aliyên wê yên ruhî û manewî bi me didine zanîn. Bi kurtasî bi alîkariya wan mirov dikare hînî hin xûy û taybetiyên civaka xwe bibe. Der barê diyarde û tiştan de fikir û ramanên wan bihewise (hîn bibe). Çawa? Em dixwazin bi nim... vê rewşê rave bikin.

"Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e." Ev gotineke pêşiyên me kurdan e. Ji her aliyî ve tê hêvişandin û parastin. "Kî hevalê pîrekê be, nikulê wî tim di pîsiyê de ye", ev jî gotineke pêşiyên me ye. Îro kî dikare naveroka wê biparêze? Ne tu kes. Lê pêwist e ku ev gotina pêşiyan bê hêvişandin, da ku sibê roj lêkolîner û lêgerîner gava bixwazin li ser rewşa jinan, di civaka kurd de, xebatê bikin bi hêsanî xwe bigihînine wan.

Di civaka me de hindikahiyên olî û etnîkî jî hene. Ji vî aliyî ve jî em xwediyê zengîniyekê ne. Ev yek, bi hêsanî dibe sedem ku em bibine civakeke demokratîk, pir–reng û pir–alî.

Der barê vê rewşê de jî biwêjek heye, "keysfileh." Peyva keys hemberî peyva fersendê ye. Fileh jî, ji îsawiyan re, ji kesên ku Hz. Îsa dihebînin re, tê gotin. Yanê xiristiyan. Ev biwêj tê vê maneyê. Kesê ku gava keysa wî/wê bikevê tu tiştî efû nake. Heta di şûna biwêja "keysfileh" de biwêja "keysperest" jî tê bikaranîn. Lê bi ya min, ev biwêj di van demên dawî de hatiye çêkirin, ji ber ku bi biwêja din tehde li îsawiyan tê kirin.

Li vir em naxwazin kûr û dûr li ser sedemên derketina vê biwêjê rawestin. Em dibêjin qey pir–hindik mijar eşkere bûye.

Kurd, der barê cînarên xwe de jî xwediyên daraziyan e. Ji bo tirkan wiha dibêjin: "Bextê mêrê romê tune ye." Ji bo ereb û ermenan jî ev gotina pêşiyan dikare bê dayîn: "Ereb û rez, ermen û pez." Li gorî vê, kurd xwediyê wê baweriyê ne ku ereb ji rez û ermen jî, ji xwedîkirina pez jî fêm nakin. Em nimûneyeke din jî bidin, der barê vê mijarê de: "Tirkên şerûd, farisên derewpût, erebên qûnrût ji me re dibêjin kurdên ji qewmên Nemrûd." Ev gotina pêşiyan, nêrîna kurdan a li hemberî sê neteweyên serdest ên ku kurdan di nav xwe de par kirine, dîde xuyakirin.

Li ser vê mijarê wekî gotinên dawî, em van bibêjin. Heta ji dest were, divê her tişt bêne berhevkirin, qeydkirin, kişandin û weşandin. Ji lew re, ew ji bo raboriya civaka me mîna neynikê (eynikê ) ne. Bi alîkariya şewqa wan, gelek tişt dikarin ronî bibin. Ev nirx û bermayî, ji bo me pêwist in. Her çendî ku naveroka wan neyê parastin jî.

# Xwîn qelenê azadiyê ye

AHMET HUSEYN

**Xwîn rijandin, ji bo jiyanê ye, ne ji bo mirinê ye. Eger jiyana bêazadî mirin be, jiyana azad jî; bêmirinî ye. Lewre ji hemû kesên ku xwe ji vî welatî dibînin, tê xwestin ku şer bike, xebatê bike û bi xwîna xwe, ruh bide welêt.**

Erê xwîn! Hema di her helbestê de, di bîranînekê de, di axaftinên li ser şerên azadiya gelan û çînan de tê mijûlkirin li ser xwînê. Heta tê zanîn ku sonda herî girîng li ba însan, sonda xwînê ye. Bi taybetî jî, di nava gelên bindest de gelek bi xwînê tê sondxwarin. Ji ber ku tu ol, nirx, şerefa gelên bindest tune ye. Dijmin hemû ji dest wan girtine. Yanê xwîn li ba însan tiştekî gelek muqades e. Pir caran tê gotin "Ku xwîn neyê rijandin, welat rizgar nabe, gel azadiya xwe nastîne, zor û zilma neyaran nayê rakirin." Gelo çima xwîn?

Dema tê gotin, xwîn; carinan mêjiyê mirov tê sekinandin û hewcedariya ramankirina kûr tê dîtin. Pergala asabê (sîstema sinêrê) hişyartir dibe; lêxistina dil xurtir dibe; şeklê ruhê mirov dikeve rewşeke taybet. Ew, di hin kesan de tirs û lawazbûnê, di hin kesan de jî kîn û nefretê xurt dike û xwesteka tolhildanê bilind dike.

Me li jor da xuyakirin ku tiştê herî giranbuha xwîn e. Ger wisa be, çima gelên bindest û kesên ku mafên wan têne xespkirin xwîna xwe dirijînin? Ji ber ku çiqas xwîn buha ye; azadî ji xwînê giranbuhatir e. Lewra Ho Chi Minh dibêje: "Ji serxwebûn û azadiyê birûmetir tiştek nîn e!"

Bi rastî jî dema mirov lêkolîneke li ser gelên azad dike, xweş dibîne ku serxwebûn û azadî ji xwînê gelek birûmetir e. Gelê Sovyetê bi xwîna 20 milyon kesî gihîşt azadiya xwe. Gelê Cezayîrê milyonek şehîd da ji bo azadiya xwe. Yanê gelên azad xwîna xwe gelek rijandine, ji bo azadî û serxwebûna xwe.

Belê, dema ji bo serxwebûna welat be, ji bo azadiya mirov be, rûmeta xwîn herikandinê heye. Derveyî vê yekê tu bandoriya xwîn herikandinê li ser mirov çênabe. Lewma, dema mirov li dîroka Kurdistanê dimeyzîne, mirovên me bi sedan hatine kuştin ji bo bihostek erd, an jî ji bo dubendiyên malbatiyê. Lê, dîsa jî her dem ji xebata neteweyî hatine bidûrxistin.

Neyaran bi fitneyên xwe her dem şerê birakujî, eşîrtî û malbatiyê di nav gelên me de kûr dikirin. Ji ber ku dizane şerên di nav gel de were rakirin, ew çax serwertiya wan jî wê were rakirin. Ew dekên dijmin bû sedema xwînrijandina vala û mandina gelê me yê bindest heyanî niha.

Hetanî derketina tevgera neteweyî hemû erxên jiyanê bi qirêja dijminê hundir û derve ve hatibûn girtin. Bi avê ne gengaz e ku werin vekirin û zengara wê were hilweşandin. Ji ber ku av sar e, lawaz e. Lê germbûna xwînê, hereketa atomên wê yên bi lez û bez ku derfet nedabûn mîkrobên biyan, gewşînên bingehîn bûn ji xwînê re û hêza xwînê ji van gewşînan tê.


Tiştê ku tevgera azadiyê di nav gelên me de kiriye, ew e ku lehiyên xwînê zivirandin ser erxa azadiyê. Bi bîrdoziya xwe ya zanistî; bi polîtîkiya xwe ya nerm û berhevkirî, zanabûn û rêxistina gelê kurd mîna pola daye damezrandin. Êdî gelê me bi kal, keç, xort û heta zarokên xwe nema ditirse ji mirinê û ji xwînrijandinê.

Ew tovê azadiyê yê ku bi xwîna Hekiyan hatibû avdan, îro rehên dara me di çiyayên welat de şîn bûne, kûr bûne, gihîştine kaniyên jînê. Ew kaniyên dara azadiyê xwîna keç û xortan in. Her bihostek ji axa welat bûne çavikên jiyanê. Belê, lêmiştên avê ji dilopên baranê têne herikandin, lê behr û çemên jiyana azad jî, bi xwîna gelan tê çêkirin.

Bêhna deşt û newalên me îro xweş e. Ew bêhna xwîna qehremanên gelên me ye. Xwîna wan bi bêhna misk û emberê hemû bala gelê me kişand ser xwe û hê jî wê bikişîne ser xwe.


Erê. Ji bo azadiyê û serxwebûnê, êdî gelê me xwîna xwe kiriye lehî û wê hê jî bike. Ji ber ku rojên li pêşiya me, rojên şerê giran in, rojên serhildan û raperînên mezin in. Derveyî vê yekê dijmin li welatê me tu derfetên jiyanê nehiştine.

www.arsivakurdi.org



**Li** gorî daxuyaniyeke Waliyê Koordinasyona Herêma Erziromê Ahmet Kayhan, heta niha hêzên dewletê hezar cerdevan bi îdiaya ku alîkariya PKK'ê kirine, girtine. Walî Kayhan, îdia dike ku ev cerdevan bi dewletê re xayîn geriyane, lewre jî ewê cezayê xwe bikişînin. Bi awayê ku Ahmet Kayhan diyar dike, ji 62 hezar cerdevanan hinekan dewlet xapandine.

Wekî tê zanîn dewletê piştî hilbijartinên berfanbara 1995'an berê xwe dabû cerdevanan. Lewre li gelek deverên ku piraniya wan cerdevan bûn, bi rêjeyeke bilind ji HADEP'ê re ray derketibûn. Ev yek bû sedema reaksiyona hêzên dewletê.




**Li** Kurdistanê partiyên çepgirên ên kemalîst her diçin, dihelin. Li gorî rêzenivîseke ku roja 7'ê gulanê di rojnameya Milliyetê de derket, li herêma kurdan partiyên çepgirên ên dewletê (CHP-DSP) piştgiriya ji gelê Kurdistanê winda kirine. Tê gotin ku di hilbijartina 1995'an van de partiyên ku demekê %50 ray standibûn, %2 ray standine.

Ev rêzenivîs ji aliyê Doç. Dr. Nilüfer Narlı, Sinan Dirlik û M. Ali Gizer ve hatiye amadekirin. Her wiha tê gotin ku HADEP li herêmê partiya herî xurt e û heke polîtîkayên van partiyan neguherin, wê xurtir bibe.



## DIK

### Kurdên YDS'ê kongreya xwe çêkirin

Kurdên ku di nav êrdima Yekîtiya Dewletên Serbixwe (YDS) de mane, her tim axîna welat kirine mertalê xweparastinê. Vê axînê rê nedaye ku ew di nav dewletên xelkê de bihelin. Her wiha ew bi vê yekê tenê jî nemane, dema mecal dîtine, di warê çand û hunerê de gavên gelekî baş avêtine.

Di salên 1920'ê bi navê Kurdistana Sor, dewleta Sovyetê otonomî daye wan, lê salên 1940'î de hatine nefîkirin. Heta Kazakistanê hatine şandin.

Heta ku Sovyetistan hebûye, wan jî karibûye di warê çand û hunerê de hin gavan biavêjin, lê piştî hilweşîna sîstema Sovyetê, rewşa wan a aborî, ew gelekî tengezar kirine. Gelek mirovên ronakbîr ketine derdê nanê xwe, dev ji pîşeya xwe berdane. Di vê demê de tevgera azadiyê gihîştiye hawara wan. Piştî xebatên wê di sala 1994'an civînek li dar xistibûn û rêxistinek saz kiribûn.

Niha êdî bi parastina hebûna xwe nasekinin, bêhna dijminan diçikînin; beramberî hemû astengiyên neyaran, ji bo avakirina yekîtiya xwe civînan li dar dixin. Wan di destpêka meha gulanê de bi beşdariya sed nûnerên ji 26 komarî civînek li dar xistin û axîna xwe, dikin qîrîn. Di vê civîna 4 rojan dom kir de gelek biryarên giring hatin girtin.

Tevî nirxandinên çalakiyên berê, mijarên wekî Kongreya Neteweyî, karê dîplomasiyê, têkiliya bi gel re hebû. Her wiha ji bo meseleya Kurdistana Sor ji nû ve bîne rojevê komîteyek hate saz kirin.

# Kilîda Rojhilata Navîn kêşeya kurd e



**Amerîka ji ber du arîşeyên li herêmê ketiye tengasiyê; meseleya Filistînê û ya kurd. Peymana di navbera Arafat û Rabin de ji ber êrîşên Hamas û Hîzbullahê ketiye xetereyê. Di kêşeya kurdan de jî nikare gotinên xwe bîne cih. Li ber vê yekê jî PKK wekî asteng xuya dike.**

Dema li ser banga Clinton, li Misirê Zîrveya Terorê çêbû, hêzên kurd wekî hedef xuya nedibûn. Lê, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di bernameyeke MED-TV'yê de diyar kir ku ew civîn li dijî wan çêbûye. Rastiya vê gotinê piştî demekê derket holê. Lewre Serokê Tirkiyeyê ku ji bo beşdariya civînê çûbû Misirê, di wir re derbasî Îsraîlê bû. Piştî demekê jî peymana leşkerî ya di navbera Tirkiye û Îsraîlê de eşkere bû. Li gorî vê peymana leşkerî wê balafirên şer ên Îsraîlê rêhewaya Tirkiyeyê bi kar bînin. Beramberî vê yekê, wê Îsraîl agahiyên der barê çalakiyên PKK'ê de bide wê. Hate gotin ku mebesta Îsraîlê û Amerîkayê di ser Tirkiyeyê re tehdîtkirina Îranê ye.

Li gorî pisporan, Amerîka li herêmê ji ber meseleya Filistînê ya kurdan ketiye tengasiyê. Aştiya ku di navbera Arafat û Rabin de hate îmzekirin, bi êrîşên Hamas û Hîzbullahê ketiye xetereyê. Her wiha di kêşeya kurdan de jî nikare, li gorî dilê xwe tevbigere. Li ber vê yekê jî PKK wekî asteng xuya dike.

Amerîka ji bo kêşeya kurd, hem li Bakur, hem jî li Başûr, çareyeke li gorî dilê xwe dixwaze. Dixwaze li bakurê Kurdistanê, ji kêşeya kurdan bêyî PKK'ê bi hin mafên çandî çareser bike. Lê, şerê gerîla rê li ber vê yekê digire.

Her wiha PKK bi vê yekê jî namîne, li başûrê welêt reh vedide; nahêle ku kêşeya kurd di dest wê de bibe qerteke erzan. Wê dixwest bi civînên Dublînê aştiya xwe pêk bîne, lê êrîşên ARGK'ê rê li ber peymanê girtin. Ev yek bû sedem ku însiyatîf bikeve destê Îran û Sûriyeyê. Piştî vê yekê di bin serokatiya Robert Deutsch de heyetek şand herêmê, lê ew heyet destvala vegerî. Piştî wî Mesûd Barzanî çû Şamê.

Amerîka li hemberî wan tiştan vala nesekinî, berî ku Deutsch biçe Başûr, di 12'yê avrêlê de rayedarê Tora Agahiyê yê Kurdên Amerîkayê (AKIN) Kanî Xulam hate girtin, bi îdiayeke ku pasaporta sexte bi kar aniye. Bi gelek şexsiyetên navdar ên Amerîkayê re têkiliyên Kanî Xulam çêbûne. Ji Remzi Kartal û Ali Yiğit re wergêrî kiribû.

Li aliyê din rayedarên Amerîkayê heta wê demê rasterast berê xwe nedidan Sûriyeyê. Her wiha têkiliyên wê û PKK'ê ev qas nedianîn rojevê. Dixwestin wê ber bi xwe bikişînin, bi Îsraîlê re li hev bînin. Lê Sûriyeyê her tim digot ku şerê azadiyê ne terorîzm e. Van demên dawîn jî tewra xwe eşkeretir kir; zîrveya terorê boykot kir. Hafiz Esad dema roja 24'ê avrêlê Warren Christopher gihîşt Şamê, ji ber ku ew 20 deqeyan dereng maye, pê re hevdîtin çênekir.

Piştî ku Robert Deutsch ji Başûr vegerî, ji pisporên dewleta Amerîkayê William Safire, nivîsek di New York Timesê de, da weşandin. Di vê nivîsê de Safire, Sûriyeyê bi du tiştan tawanbar dike. Safire dibêje ku Hafiz Esad du şerên terorê dide meşandin. Yek ji wan bi riya Hîzbullahê, li dijî Îsraîlê, yê din jî bi destê PKK'ê li dijî Tirkiyeyê. Her wiha ew îdia dike ku PKK bi kurdên ku ew diparêzin re jî şer dike.

Safire ji Îsraîl û Tirkiyeyê dixwaze ku li hemberî Sûriyeyê hevkariyê bikin. Ji Îsraîlê dixwaze ku guh nede berteka welatên ereb û di warê aborî, leşkerî de bi Tirkiyeyê re hevkariyê bike armanca xwe ya sereke.

Ew ji Tirkiyeyê jî dixwaze ku dev ji pêkutiya li ser kurdan berde, nasnameya wan a çandî nas bike. Her wiha dev ji polîtîkayên leşkerî ku kurdên bêçare, radîkaltir dike berde, tevî Îsaîlê li ser planên rûxandina kampên li Bekaayê bixebite.


Helwesta Amerîkayê ya tûj di rapora 1995'an a dewletê de jî xwe dide der. Ev rapor jî bi giranî tevî Îran, Iraq û Sûriyeyê, PKK'ê jî wekî tehdîtekê destnîşan dike.

Her wiha Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan roja 7'ê avrêlê di bernameya Forum ya MED-TV'yê de diyar kir ku piştî peymanê, hêzên Îsraîlê berî daye wan jî. Tevî vê yekê êrîşa ku hêzên tirk ji 5'ê gulanê ve bi mebesta avakirina herêmeke tampon dibin ser Başûr jî, diyar dike ku bereyek li dijî gelên herêmê ava bûye. Lê li dijî wan, pêwîstiya bereyekî gelên herêmê xuya dike. Lê Îran, Tirkiye, Sûriye, Iraq li dijî kurdan her tim mil dane hev. Ev dewletên, dibin hedefa êrîşên bereyê paşverû heta mafên kurdên xwe nas nekin, nikarin tu gavên pêşverû biavêjin.

SAMÎ BERBANG

www.arsivakurdi.org

# Cil û bergên Herêma Culemergê



**Mîna herêmên din, li Culemergê jî kalîteya cil û bergan û xemilandinê, bi rewşa aboriyê ve girêdayî ye. Ji cil û bergên wan aboriya wan nîşan dide ku ji kîjan çînî ne. Sê cure mekûk hene: Bi piranî neh mekûk mîr, pênc mekûk axa û sê mekûkan jî gundî li xwe dikin.**

Cil û bergên zilamên li herêma Culemergê şal û şapik in. Yên jinan jî etekê fireh û dirêj in ji qumaşê tenik çêdibin û çend parçe bi ser hev de ne. Bi taybetî cil û bergên jinên Culemergê, ji yên jinên herêmên din dewlementir û balkêştir in. Bi vê yekê mirov divê bandora Mîrîtiyên Botanê û bi dewlemendiya aborî bîne bîra xwe.

Piştî vê agahiya kurt, em dikarin cil û bergên Culemergê (Botan) yên jin û mêran ji hev veqetînin û binasin.

## Cil û berg û xemla mêran

1) Şal, 2) Şapik, 3) Gomlekê bêberstûk, 4) Êlek, 5) Binkiraskê ku di bin şal û şapikan de tê lixwekirin, 6) Qûşax (şar, palaska an jî şeleme, kesrewan) 7) Cemedan, 8) Reşik, çarik, 9) Gulivank (rêşîkê bi serê doxînê ve). Doxîn, 10) Saeta bikostek, 11) Hemayil 12) Bazbend, 13) Goreyên hirî.

## Cil û bergên mêran yên lixwekirinê

Şal û şapikên mêran, ji hiriyê ne û bi destan têne çêkirin. Ji ber raçandina wan, mûyê wan di laşê mirovan re diçin, an jî laşê mirovan dixwirînin. Lewre ji ku bo rê li ber vê yekê bê girtin, mêr binkiraskan li xwe dikin. Bi ser de jî şapik û gomlekê bêberstûk (hakim yaka) li xwe dikin; di bin gomlek de jî şal li xwe dikin. Şal û gomlek dixin bin şapikê û doxînê li ser girêdidin. Li ser jî şelemê an jî şarê girê didin.

Dema şelemê girê didin, palaska ji çerm çêkirî pê ve dikin, an jî kesrewanê lê girê didin. Êlek jî bi ser wan de li xwe dikin. Cemedanê li serê xwe girê didin. Gorên hirî yê bi mixerm dixin piyên xwe. Ji bo pî û goreyên xwe biparêzin jî, çarik an jî reşikan dikin piyên xwe.

Di xemilandinê de jî bazbend li milên xwe girê didin û hemayilê jî dixine stûyê xwe.

Mîna herêmên din, li herêma Culemergê jî kalîteya cil û bergan û xemilandinê bi aboriya wan ve girêdayî ye. Ji cil û bergên wan, aboriya wan nîşan dide ku ji kîjan çînî ne.

Em şal û şapikên ku li gelek herêmên me têne lixwekirin, hinekî binasin, dirûna wan, mixerm (nexş) û parçeyên wan têne çi wateyê, taybetiyên wan çi ne?

A– Parçeyên şalan û wateya wan

1) Maldoxîn: Dera ku doxîn pê ve dibe.

2) Dirûn: Dirûna ku maldoxîn û parçeyan pê ve dike.

3) Doxîn: Ji hiriyê tê honandin, bi serê wan ve rîşik hene. Hejmara rîşikan diguhere.

4) Zincîr: Mixermên bi destan û şeklekî xwarûpêçk têne çêkirin.

5) Gula Şaxê (Culemergê ne ya li nik Silopiyê) di bin zincîrê de hatiye honandin û mixerma bi zincîrê ve ye.

6) Kixme (ji reha gûzê, sûsê, strîkê çêdikin, çêkirina kixme zehmet e)

7) Mekûk: Sê cure mekûk hene: Sê mekûk, pênc mekûk û neh mekûk in. Bi piranî neh mekûk mîr, pênc mekûk axa û sê mekûkan jî gundî li xwe dikin.

## Navê şal û şapikan bi piranî ev in:

Osmanbegî, Bekirbegiyê navqelaştî, kixme, rencberî, aravî, karçîtiyê spî.

Karçîtiyê spî heta îro ji Ezdîn Şêr pê ve tu kesî li xwe nekiriye.

8) Sattî: Xêza zirav a ku li ser şal e

9) Parçeyê ku dibine ber parçeyê hundir, navê wî jî dibe berdeling.

10) Xwarîfajik: Navê dirûna ku parçeyan pê ve dike ye.

11) Giştik: Parçeyê zirav û teng e, ku di binê berdelingê şal de tê dirûn.

B) Mixermên şapikan jî mîna yên şalan in. Lê ji xeynî wan bi devê milikan ve zendik û milzendik jî dibin.

C) Parçeyên ku êlek jê pêk tê

1) Pisto (piştstû) 2) Benyê êlek, 3) Kûrika saetê, 4) Kûrik, 5) Qîtana devê kûrikê 6) Betan, 7) Qedek, 8) Piştik.

D) Şeleme; ji hiriyê tê honandin û bi mixerm e. Firehiya wê 15–20 cm e. Şal jî, ji mûyan tê honandin. Çargoşe ye û bi serê wan ve rîşik hene.

E) Reşik

1) Ben, 2) Pirik, 3) Qulfik, 4) Jêr taban e, ser jî honandî ye. Mixermên din jî mîna yên şal in.

Piştî me bi vî şeklî cil û bergên mêran vegotin, em niha jî bala xwe bidine cil û bergên jinan.


## Cil û bergên jinan

1) Fîstan, 2) Kiras, 3) Binkirask, 4) Kofî, 5) Çarik, reşik an jî pêlava cizlawêt, 6) Derpê, 7) Di stûyan de morîk, 8) Ji poz re xizm, 9) Ji zendan re bazin û morîk, 10) Ji guh re guhar, 11) Ji tiliyan re gustîlk, 12) Ji qevdikên piyan re morîk û xirxal 13) Tolbend 14) Ji bo xemilandina kofiyê zêr an jî zîv, 15) Pûşî, 16) Şalwar, 17) Êlek

## Şeklê lixwekirina jinan

Şalwar li xwe dikin (piştî şalwar binkirask li xwe dikin) bi ser wan de jî kiras li xwe dikin. Bi ser kiras de jî fîstan, ku pêşiya wî vekiriye û ji newqê ve bi pişkokê diavêjine hev, li xwe dikin. Bi ser wan de şeleme an jî kemera zîv girê didin. Hinek jin bi ser wan de êlek jî li xwe dikin. Kofî an jî dersok didine serê xwe, lêçeka spî diavêjine ser pûşiyan û girê didin. Dersok jî bi xemlên ji hiriyê tê xemilandin. Dema van tiştan çêdikin, ristikê zêr an jî zîv li ser kofiyê girê didin.

Goreyên hirî li xwe dikin. Reşik, ça-



www.arsivakurd.org




rik an jî cizlawêt dixin piyên xwe. Pişt re lewendiyê kirasê ku di bin fîstan de li xwe kirine, girê didin û diavêjine pişt xwe.

### Parçeyên ku cilên jinan jê pêk tên

1) Fîstan: a) zendik, devê milikan, b) qermîçonk, c) dangê wê, d) qutik, e) gîvan.

2– Kiras: a) bersing (sersing), b) daw, c) serdaw, d) lewendî–levendî ji sê parçeyan pêk tê.

3– Derpê: a) doxîn, b) boy, c) deling

Ji herêma Botan Mamê Mistê Aras (71 salî), Mamê Miheme Bağıryanık (60 salî) zanînên der heqê cil û bergan de ji bav û bapîrên xwe hîn bûne.

a) Şal: 1) Maldoxîn, 2) dirûn, 3) doxîn, 4) zincîr, 5) Gula Şaxê (Hekariya, ne ya li nik Silopî) 6) kixme ( ji reha gûzê, sûsê, strîk çêdikin, çêkirina kixmê zor e) 7) Îşareta mekûkê ye. Sê cure mekûk hene:

Sê mekûk, pênc mekûk û neh mekûk. Yên ku rewşa wan a aboriyê pir baş be neh, yên ku rewşa wan ne baş be sê mekûk li xwe dikin. Pênc mekûk ji yên rewşa wan navçe be li xwe dikin.

Cureyên şal û şapikan ev in: "Osmanbegî, bekirbegiyê navqelaştî, kixme, rêncberî, aravî, karçîtiyê spî: Ezdîn Şêr li xwe dikir. 8) Şaftî, 9) Berdeling, 10) Xwarifajik, 11) Giştik

b) Êlek:

1) Pisto (piştstû), 2) Berya êlek, 3) Kûrika saetê, 4) Kûrik 5) Qîtana devê kûrikê, 6) Betan, 7) Qedek, 8) Piştik

C) Şapik

1– Milê şapik, 2) Zendik

d) Şeleme, e) Şar, rişyê şarê, f) Reşik

1) Ben, 2) Pirik, 3) Qulfik

9– Cemedan

### Xemilandin

1) Gulivank (rîşikê bi serê doxînê ve bi ser şal ve berdidin.)

2) Saeta bikostek

3) Hemayîl

4) Bazbend

5) Kesrewan (şeklê şelemeyê ji derve girêdayî)

Yên ku em serwext kirin ji Xezxêr (Berwarî) gundê Êrkendê ne. Ji Êla Garisan e. Gund li nik Çiyayê Herekol e.

### Cil û bergên jinan

1– Fîstan: a) Zendik, b) Qermûçik, c) Dangê wê, d)Qûtik, e) Gîvan

2– Kiras: a) Bersing (sersing), b) Daw, c) Serêdaw, d) Lewendî, lewendî du parçe ye, ji bo sipehiyê ye.

3– Kum: a) Dersok, b) Kofî

4– Pêlav: a) Cizlawêt b) Goreyê dirîs

5– Derpê: doxîn, deling

6– Binkirask wekî kiras e, lewendiya wê tune ye.

7– a) Ristik (di stû de), b) Qarafila zêr (di poz de), c) Bazin (di zendan de), d) Guhar (di guh de), e) Gustîl (di tiliyê de).


XELEF ZINARÎ

Wergera ji tirkî:

SONGÜL KESKİN

# Rewşenbîrên kurdan

FIRAT CEWERÎ



Tevgera rewşenbîriya kurdî her tim li derveyî welêt dest pê kiriye û her li derveyî welêt geş bûye. Ger em zêde dûrtir neçin, emê bibînin ku rojnameya kurdan a pêşî "Kurdistan" ku di bin berpirsiya Mîqtad Mîthet Bedirxan de derdiket, di sala 1898'an de li paytextê Misirê, li Kahîreyê û her ji wir ji bo şiyarbûn, yekîtî û zanînê bangî kurdan kiriye. Piştî wê, kovara "Jînê" li Stenbolê dest bi jiyana xwe ya weşanê kiriye.

Di Jînê de mirov pêrgî nivîsên komek rewşenbîrên kurd tên ku li ser civat, cografya û rewşa kurdan a siyasî nivîsandine. Her wiha piştî têkçûna Serhildana Agiriyê Celadet Bedirxan li Şamê dest bi weşandina kovara Hawarê kiriye û di pêvajoya jiyana kovara Hawarê de bi çendan nivîsên balkêş û nivîskarên balkêş derxistine. Dîsa di salên şêstî–heftê de Faik Bucak, Musa Anter, Edip Karahan, Yaşar Kaya derketine, lê xebatên wan ên rewşenbîrî li derveyî tixûbên Kurdistanê ne. Di salên 80'an de, bi hatina cûntayê piraniya rewşenbîr û siyasetvananên kurdan derketin derveyî welêt û digel xebata siyasî, xebatên entelektuelî jî li paytextê hin welatên Ewrûpayê bi pêş de çûye. Hin ji vê xebata entelektuelî ji ber sedemên xuyayî ve negihiştine welêt, welatî jê bêpar mane. Ji ber tunebûna pirek danûstandinê di navbera nivîskar û xwendevanan de û nebûna bazareke edebiyatê û rewşenbîriyê, berdewamî li ba nivîskar û rewşenbîrên kurdan çênebûye, piştî demekê, mecbûr mane, dev jê berdane.

Ez dixwazim di vir de behsa du rastiyên tehl bikim. Yek, di destpêka geşiya edebiyatê de, tevgera siyasî qels e, di xurtbûna tevgera siyasî de, kultur û edebiyat li paş e. Yanê, di dîroka Kurdistanê de, ev her du bi hev re nemeşiyane. Bi taybetî jî, di tevger û serhildanên Kurdistanê de, tevger û serhildanên kulturî, rewşenbîrî û edebî çênebûne. Ji ber vê yekê, di nava nivşan de jî qutbûnek çêbûye. Yanê nivşê piştî deh–bîst salan hay ji nivşê berî xwe nemaye û tu sûd ji nivşê berî xwe negirtiye.

Niha, gava em li dîroka Kurdistanê ya nêzîk dinêrin, bi qasî hejmara serhildanan, ger berhemên edebî hatibûna afirandin, wê dîsan ji bo dîroka edebiyata kurdî çirûskeke hêviyê bûya. Wê ji nivşan bigihîşta nivşan û wê îro hin problemên nivîsandina kurdî hatibûna çareserkirin.

Rastiyek heye ku divê em bibînin, ew jî piştî salên heştêyî edebiyata bi zimanê kurdî bi gelemperî li derveyî welêt û bi taybetî jî li Swêdê geş bûye. Dîroka vê jî ne dirêj e, deh panzdeh salek e. Bi zimanê qedexekirî, bi zimanê mirî, dest bi nivîsandina şiîr, çîrok, roman û hwd. hatiye kirin. Ev xebat hê berdewam e, dibe ku berê vê xebatê hêdî hêdî di rojên pêş me de xuya bibin. Lê ger ji niha ve berê vê xebata rewşenbîrên kurdan bi welêt venebe, ev xebat negihîje welatiyan; dikare mîna dara ku av ji ser were birîn, hişk û bêber bibe.

Ji bo jîndarhiştina vê keda salan barekî mezin dikeve ser milên rewşenbîrên kurdan yên li welêt jî. Divê ew jî êdî xwe ji ramana kemalîzmê ku ji derveyî îradeya wan mêjiyê wan dikuje, azad bike, dev ji sloganên înternasyonalîst ên pûç û vala berdin, li rastiya xwe û rastiya rewşa welatê xwe vegerin. Bi avakirina pirek danûstandinê ya di navbera rewşenbîrên kurdan ên li derveyî welêt û li hundirê welêt, wê hevdûnasîneke dîrokî pêk were, wê berhemê vê hevdûnasînê civata me ya tarî ronî bike û wê bikaribe otorîteya xwe ya rewşenbîrî di civatê de ava bike.

Her wiha wê têkiliyeke xurt di navbera wan û gel de jî çêbe, wê nedin dû gel, lê wê gel bi dû xwe de bikişînin. Wê riya ronî, riya qenc nîşanî gel bidin, wê wan ber bi cîhana medenî ve bikişînin.

Civateke bêyî rewşenbîr civateke ker e, kor e, nabihîze; civateke kût û bawî ye... Lê belê berpirsên rewşenbîran jî pir in, giran in; divê der heqê de çîroknivîskarê rûs Çexov dibêje: "Hêz û rizgariya gel di destê rewşenbîrên wî de ye; rewşenbîrên binamûs, ramanwer, şiyar û xebatkar."

Ma şiyarkirin û rizgarkirina kurdan jî ne di destê rewşenbîrên kurdan ên xwenas de ye?..

www.arsivakurd.org


# Serencama çûçikên Apê Mûsa

**Nêzîkî êvarê min dît Birêz Yaşar Kaya (Kastro), bi sê–çar hevalên xwe ve hat. Em zehf kêfxweş bûn. Cihê ku Yaşar Kaya lê bûya, kêf û ken jî li wê derê bû. Hîna henekên Birêz Yaşar Kaya didomiyan...**

Di bihara sala 1969'an de Xalê Mûsa panzdeh çûçikên mirîşkan kirîbû û di nav bexçeyê mala xwe de xwedî dikir. Pisîkeke wî ji celebê Wanê hebû, spî wekî berfê, çavekî wê şîn, yê din zer bû. Li ber çûçikan bû, da ku nekevin nav lemên bacanan. Her roj bi vî awayî, pisîkê ew çûçik li nav baxçeyê diçêrandin. Şivanê wan çûçikan bû.

Roj, heftî û meh derbas bûn, gişt mezin bûn. Bûn dîk. Hûnê bibêjin "Çawa gişt bûne dîk? Ma mirîşkek jî di nav wan de derneket." Na birano, hûn ji min bawer bikin, gişt wekî xwediyê xwe dîk derketin. Şivanê wan jî pisîka Xalê Mûsa, Gulo bû. Her êvar ew di ajotin koxa (pîn) wan û li ber derî disekinî; Xalê Mûsa jî derê koxê li wan digirt. Her hefte yek, dudo ji wan me serjê dikirin, dixistin ber savarê.

Wê salê bîst û yekê meha pûşperê (hezîran) perwerdeya min kuta bû. Piştî nîvro ez çûm Sûadiyeyê mala Xalê Mûsa. Derî gişt girtî bûn, tu kes li malê tunebû, ez zivirîm nav baxçeyê. Deriyê midbaxê, di nav baxçe re derdiket û vekirî bû. Çar dîk mabûn, ew jî li nav baxçeyê diçêriyan.



Gulo jî di bin lemeke bacanan de li raserî wan, li ber siyê paldayî bû. Ez li bin dara çamê, li ser kursiyekê rûniştim. Min li rewş û dîmena Gulo û wan dîkan temaşe dikir. Her ku dîkek ber bi lemê bacanan ve dihat, Gulo êrîşê wî dikir û ew di nav daran de dibezand. Dîsa dihat li bin wî lema bacanê mexel diket. Gulo, şivantî û nahtoriya xwe bi saxlem û bi rastî bi cih dianî. Ez li wan matmayî mam, bi taybetî li Gulo.

Dawiyê ez rabûm, min her çar dîk girtin û serê wan jêkir û min ew avêtin midbaxê, hatim ser kursiyê xwe rûniştim. Li benda Xalê Mûsa mam. Gulo tiştek ji wê bûyerê fêm nekir, di bin lemê de, li ber siyê ji nahtoriya xwe tenê fêm dikir.

Saetek tê neçûbû, min dît Xalê Mûsa di peyarêya kolanê de dimeşe, qayîşa Îrma di destê wî de ye, pê re dipeyive û tê (Îrma, kûçika wî bû, piştî mirina Kejê jê re ji Almanyayê anîbûn). Em çûn rûyê hev. Qedîna perwerdeya min píroz kir. Paşê got:

– Lawo ka em haziriya şîva êvarê bikin.

– Xalo min dîk serjê kirine. Wa li midbaxê ne.

Em pev re çûn midbaxê. Çav li cendekên wan kir, li min vegeriya û got:

– Lawo te çima îro her çar dîk serjê kirin?"

Min got:

– Xalo îro em dê kutabûna perwerdeya min pîroz bikin. Dibe ku çend heval jî werin, da xwarin li me kêm nekeve.

– Ma te kesek vexwendiye xwarinê ?

– Na.

– Ma tu çi zanî ku wê mêvanên me werin?

– Wilo niqutî dilê min, ma jixwe tu jî êvaran bêmêvan namînî? (Bi rastî, di wê demê de xortên kurd ên pêşverû û welatparêz, piraniya wan dihatin mala Xalê Mûsa)

Me dîk pirtikandin. Me ew hûr (qet) kirin, şûştin û avêtin beroşê û pişt re me ew dan ser êgir. Em hatin salonê, me Radyoya Erîvanê vekir û lê hisand. Paşê teyba xwe şixuland, li dengê ribab û awaza M. Eliyê Mitirb me guhdarî kir. Goştê me jî li ser êgir dipijiya.

Nêzîkî êvarê min dît Birêz Yaşar Kaya (Kastro), bi sê–çar hevalên xwe ve hat. Em zehf kêfxweş bûn. Cihê ku Yaşar Kaya lê bûya, kêf û ken jî li wê derê bû. Hîna henekên Birêz Yaşar Kaya didomiyan, min dît M. Ali Göçme jî, bi çar heva!ên xwe ve hat. Hevalên xwe bi me da nasandin. Yê yekemîn got:

"Navê min Alî ye." Yê dû re got: "Navê min Alî ye." Yê sêyemîn got: "Navê min Alî ye." Kesê çaremîn jî got: "Navê min Alî ye."

Em gişt bi hev re keniyan; Birêz Yaşar Kaya li M. Alî Göçmen zivirî û got: "Navê te jî Mihemed Alî ye. Ji bo çi navê we Kirikxaniyan bi piranî Alî ne?" M. Alî lê vegerand:

– Dema ku kurek ji yekî re çêdibe, ji yê din dipirse ka em çi navî lê bikin, em jî dibêjin hema navê min lê bikin. Ji ber vî awayî navê me giştan Alî ye.


Êvarê çend xortên din jî hatin, gorbihuşt savarekedin jî, di ber re çêkir, selete û heşînayî li ber goştê dîkan danî û sifreyeke mezin anî holê. Bi ken û kêf, hinek jî bi qala mijara siyasetê, me şeva xwe borand.

Î. OMERÎ



www.arsivakurdi.org

## BÛYERÎN JI DÎROKÊ



● **16.05.1926**
Destpêka Serhildana Çiyayê Agirî. Cara yekemîn hêzên dewleta tirk û hêzên kurd li Çiyayê Agirî dest bi şer kirin.

● **18.05.1950**
Kovara bi navê "Şarkın Sesi" Dengê Rojhilatê dest bi weşanê kir.

● **15.05.1963**
Rojnameya "Roja Newe" dest bi weşanê kir.

● **18.05.1973**
Serokê TKP-ML/TİKKO (Partiya Marksîst-Lenînîst a Tirkiyeyê/Artêşa Rizgariya Gundî û Karkerên Tirkiyeyê) İbrahim Kaypakkaya li Girtîgeha Amedê ya Leşkerî bi îşkenceyê hate kuştin.

● **18.05.1977**
Ji endamên PKK'ê yên sereke Haki Karer, li bajarê Dîlûkê (Entabê) ji aliyê hêzên tarî ve hate kuştin.

● **18.05.1978**
Ji Serokên PKK'ê Halil Çavgun hate kuştin

● **18.05.1982**
Çar Lehengên kurd Ferhat Kurtay, Necmi Önen, Eşref Anyık û Mahmut Zengin, li Girtîgeha Amedê ya Leşkerî ji bo protestokirina zilmê, xwe şewitandin.

## AWIR

# Ji Koma Agirê Jiyan kaseteke nû



**Tê dîtin ku, Koma Agirê Jiyan bi awayekî nûjen besteyan çêdike. Radeya ku ev kom gihiştiyê gelekî baş e; pêşiya wan vekirî ye.**

Di nav çalakiyên NÇM'ya Stenbolê yên meha gulanê de konserek hate dayîn. Konser ji aliyê Koma Agirê Jiyan ve ku yek ji komên NÇM'ê ye, hate pêşkêşkirin. Komê roja 6'ê gulanê êvarî saet li 6.30'an dest bi konsera xwe kir û heya saet 7.45'an domand. Mebesta komê ji dayîna vê konserê, danasîna kaseta xwe ya nû bû jî.

Di konserê de pêşî strana yekemîn "Girtî", dûv re jî helbesta "Reşanê Reşan" hate pêşkêşkirin. Ev helbest bi destê M. Zahir Kayan hatibû bestekirin. Stran li xweşewitandina keça kurd Rehşan Demirel e.

Rehşanê, di Newroza 1992'yan de, li Kadifekaleya bajarê İzmîrê ji bo protestokirina zilma dewleta tirk xwe şewitand dibû.

Helbestên din jî, bi zêdeyî li ser rewşa gel û li ser rewşa têkoşînê bûn. Stranên ku pêşkêşî me bûn:

Girtî, Lêxin Birano, Roj Baş, Çaryar, Werva Qişle da(kirdkî)

Werne şer, Dîlan, Adarê, Şemamê (kirdkî), Gicilok, Newalo, Golê de, Wa avê, ev hemû di kesata wan de cih digirin. Berhevkirin û bestekirin bi destên komê hatine çêkirin.

Di nav vê xebatê de cihê Mahmut Yamali girîng e. Ji ber ku ev kes endamê sazkirina Koma Agirê Jiyan e û hem jî bi piranî beste û xebatên wî di nav repertuvara komê de şûnê distînin.

Her çiqas kom pênc kes xuya bike jî, esas ew ji çar kesan pêk hatiye, bilûrvan Yasin bi mêvanî beşdarî xebatên komê dibe. Endamên komê Şener (saz, gîtar), Naîl (org), Alî (tumba), Yasîn (bilûr) û Bêrîvan jî wekî solîst tê de cih digire. Di konserê de 15 stran hatin pêşkêşkirin. Hate dîtin ku Koma Agirê Jiyan bi awayekî nûjen besteyan çêdike. Di nav wan besteyan de tarzên wekî Jazz-Rock û folk-country tên bikaranîn.


Lê belê kêmasiyên komê zêdetir di warê lêkolînên li ser van tarzan de hene. Li aliyê din heke hinekî bala xwe bidin ser perwerdehiya Şan-diyafram û formên muzîkên rojavayî; ez bawer im ku wê xebatên wan gelek pêş ve biçin.

Radeya ku ev kom gihiştiye, gelekî baş e; pêşiya wan vekirî ye. Ev konser diyar dike ku wê Koma Agirê Jiyan karibe berhemên xweşiktir jî pêşkêşî guhdarên xwe bike. Jixwe temaşevanan bi çepikên xwe ev rastî tesdîq kirin. Koma Agirê Jiyan nêzî sê salan e ku bi berdewamî xebatên xwe yên li ser muzîka kurdî didomînin. Ev kaset jî berhema vê keda sê salan e.

DÜZGÜN DENİZ

## ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



# Çend gotin li ser dîroka sînemayê

Sînema, yekemîn gava xwe di 28'ê Kanûnê sala 1859'an de li Parîsê diavêje. Heger mirov bi du birên gelekî mezin û pir serekî bi nav bike, wê demên bêdeng û bideng nas kirin. Gelek aktor û sînemavanên jîr û navdar anîn pê û bi mora henekçî û komedyenên mîna Charlie Chaplin, Herry Longdan, şarezayên wekî Griffs, derhêner û rejîsorên mîna Sergey Ainseinstein, Fasbinder, Andrei Vaydan, Andrei Tarkovski, Milosh Forman, Ingmar Bergman, Francis Ford Kapola û bi mor û xizmeta mirovên mîna Yılmaz Güney dixemilîne, distewe û heta bi roja me tê. Sînema hê di 10 salên ewil yên sedsala XX'an de bala milyonên mirovan dikişîne, dibe wesîte û awayekî wextbuhurandinê. Ji ber vê jî dibe saheyeke bazirganî û teknîkê.

Mirov ji bo salên navbera 1850'an û 1910'an dikare bibêje salên ceribandin û başkirina teknîka sînemayê. Ji bo salên ji sala 1910'an heta bi sala 1927'an re jî bibêje salên sîmemaya bêdeng. Di nav salan de hêdî hêdî di teniştа fîlmên kin û yek-kamerayî de fîlmên dirêj û çendkamerayî çêdibin. Her wiha di van salan de hem reqabeta navbera welatan û hem jî ya di nav şîrket û malbatên fîlmçêkeran de xwe dide der. Salên berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, sînemayên fransî û îtalî li pêş in. Bi taybetî sînemaya Fransa di salên şer de, di aliyê komediyê de gelek fîlmên hêja û xwedîşop çêdike. Salên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û nemaze piştî 1920'an sînemaya alman xurt dibe û hosteyên navneteweyî mîna Fritz Lang û F. W. Murnaw derdixe. Di van salan de Yekîtiya Sovyetê bi mebesta ajîtasyon û propagandayê, bi mebesta rohnî, hişyar, perwerdekirinê sînemayê bi kar tîne û dibe xwediyê nimûneyên hêjayê pesnê ne. Sovyet gavek din jî ku çu welatî navêtiye, diavêje û cara ewil enstîtuyeke dewletî ya sînemayê dadimezirîne.

Ev sînema bi xwe re kesên wekî Lev Viadimîrov Kuleşov, Sergey Ainseinstein û Vshevolod Larinoviç Pudovkin dixuliqîne. Pêşketina sînemayê û zêdebûna salonên sînemayê li pir dever û bajaran tesîrê li hejmara temaşevanan jî dike û bi tenê li Amerîkayê sala 1920'an di heftiyekê de 40 milyon însan diçe sînemayê.

Zêdebûna temaşevanan, sînemakar, teknîka fîlmpêşandayînê û bazirgan û şîrketên fîlman jî han dan û êdî sînemaya bideng dest pêkir. Di nav 15 mehan de di salên 1927'an û 1929'an de hemû sînemayên li Amerîkayê xwe guhertin û xwe li gorî şertên nû, şertên sînemaya bideng sererast kirin.

Helbet pêşketin û guhertinan bi xwe re daxwazên nû û pê re jî pirs û pirsgirêkên estetîkî, teknîkî û kadroyî anîne. Mesela, gelek aktor û hunermendên dewra sînemaya bêdeng ji ber ku axaftinên xwe baş ji ber nedikirin, yan jî ji ber ku dengê wan û hereket û dîmenên sehnê hev û din nedigirtin, hêdî hedî bêrûmet bûn, bêkar man. Li hemberî vê rejîsorên ku hoste û jîr bûn, stêrkên roj û qonaxa nû.

Tiştekî din di vê qonaxê de ku hêjayî bîranîn û binavkirinê ye dublaj û teknîka dublajê ye. Sala 1929'an dublaja yekemîn King Vidor di fîlmê Halaluyah de dixe jiyanê. Şaxeke din ku di vê serdemê de ji diya xwe dibe û ji xwe re cihekî xurt çêdike fîlmên muzîkal in. Mîna Walt Disney. Divê ev jî bê gotin ku piştî sînema derbasî qonaxa bideng dibe sînema herî xurt û li pêş sînemaya Fransayê ye. Sînema li vî welatî di salên 1930'î de dikeve baştirîn qonaxa xwe û navên mîna Renê Clair, Jan Jemnoir li her aliyê dinyayê bela dibin. Di salên Şerê Cîhanê yê Duyemîn de dabaş û temayên sînemayê bi piranî li ser şer in. Piştî şer salên dawî yên 1940'î û destpêka 1950'î navê Pêla Nû li gelek welatên Ewrûpayê û dinyayê tevgereke xurt û rexnegîr tê ser qada sînemayê. Li Fransa û li Îtalyayê berdevkên vê hereketê li dijî qalibên ku kevinên li Hollywood û Ewrûpa hene derdikevin û bi taybetî rejîsorê Fransî Aleksander Asturc roleke xuya dilîze. Di salên 60'î de di cebheyê sînemayê de guhertin û diyardeya herî li ber çav sînemaya welatên cîhanê sêwemîn e. Wekî sînemaya Amerîka Latîn.

Mîna her aliyê jiyana rewşenbîrî, hunermendî û afrenêrî di eniya sînemayê de jî pir biçûk û zêde nexuya jî be di nav kurdan de lebit û qelqek peyde bûye. Rejîsor û sînemenasên kurd diponijîn mirov çi dikare bike; li vir û li dera han, di vê konferansê û di konferansa din de berçav dibin û dengê wan tê bihîstin.

www.arsivakurdi.org

# 'Ne însanên bêerd, însanê

**Nivîskar Ahmet Altan, tevî malbata xwe xwedî sifateke cihêreng e. Bi fikrên xwe yên li ser sîstema li Tirkiyeyê û meseleya kurdan balê dikişîne ser xwe. Hevala me** AYNUR BOZKURT **bi wî re li ser gelek mijaran peyivî.**



Wêne: Düzgün Deniz

*Ji vê cografyayê, bi rastî jî kêm rewşenbîr derdikevin ên ku bersivê didin dema xwe. Hûn tevî malbata xwe di nav wan rewşenbîran de cih digirin. Gelo çi bûn sebeb kû, hûn hatin vê merhaleyê?*

– Ez zen nakim ku em tiştekî taybet dikin. Tiştê tê kirin jî, ew tiştê ku "divê bê kirin" e. Çi ye tiştê ku divê bê kirin; fikrên xwe divê mirov bîne zimên. Ez çi tiştên ku difikirim, dibêjim jixwe. Tiştên difikirim jî ev in: Bi domkirina şerê di vî welatî de, rê li ber her kesî, hem li ya tirkan hem jî li ya kurdan tê girtin. Îro dewlet her sal nêzîkî 8 milyar dolarî li şer xerc dike. Ev tê vê maneyê; pereyên ku ji bo karekî divê bê xebitandin, hilberîn (üretim) divê pê bê kirin, ji bo şer tê bikaranîn. Ev tê maneya girtina fabrîkayan û bêkarmayînê jî. Îhracat kêmtir dibe û ew hilberîna ku jixwe kêm e, hê kêmtir dibe. Yanê ji aliyê aboriyê ve tê maneya xizanbûyîna jiyanê. Ji aliyekî ve jî ew zarokên ku dimirin, dixwazî bila unîformaya leşkerî li xwe bikin, dixwazî bila rozeta PKK'ê bi xwe ve bikin, di encamê de zarokên vî welatî ne.

Ji bo min kurd an jî tirkbûna wan ferq nake. Ew zarokên 20 salî ne û yên hê biçûktir jî hene di nav wan de. Ew welatiyên vî welatî ne û em welatiyên xwe, zarokên xwe bi destê xwe dikujin. Ji xeynî vê, ez baweriya xwe naynim bi pêwistiya vî şerî jî. Carinan ji bo welatekî dibe ku şer gerek be, lê vêga tu mecbûriyeta şerekî ji bo Tirkiyeyê nîn e. Tirkiye pirsgirêka kurdan di nav aştiyê de, bi demokrasiyê dikare hel bike.

Gotinên bi vî rengî ne tiştekî taybet e. Lê, li vê derê wisa derew tên kirin ku, dewlet jî li hemberî fikreke ji rêzê wisa reaksiyonê nîşan dide ku, tu ji bo welatê xwe bibêjî, "em derbasî demokrasiyê bibin", ku ev hevok li dinyayê hevoka herî ji rêzê ye, dibe hevokeke gelekî cidî û bitalûke û her kes dibêje, "Hela hela! vî ev çawa got?" Hinek aqlê te, hinek jî wijdana te hebe, jixwe wekî din tu gotineke ku mirov bibêjê nîn e.

*Gelo zêde kes ne xwedî aql û wijdan in li vî welatî?*

– Na, na! Ez dibêjim hene. Ew qas jî ne kêm in, yanê ez ne bêhêvî me. Îro di Bab–i Aliyê de alîgirê aştiyê ew qas însan hene ku, mirov lê heyirî dimîne, tevî qîrên şerxwaziya dewletê. Belkî ev di rûpelên yekemîn de xwe nede der, lê di nivîsên quncikan de tê dîtin.

*Hûn tenê ji quncikê xwe, dengê xwe derdixin û fikrên xwe tînin zimên. Ev jî dibe sedema rexnekirinê.*

– Ha, ez çima wekî mîlîtanekî hereket nakim.

*Na, ne wisa! Çima tenê quncik bes tê dîtin. Wezîfeya ku li ser rewşenbîran e...*

– Ez nivîskarek im. Karê min nivîsandin e. Derdekî min î ku ji xeynî vê jî ez mîsyoneke din hilgirim ser xwe, nîn e. Ez nivîskariya quncikan dikim û pê re jî romanên xwe dinivîsim. Ez ji welatê xwe zêdetir ji nivîsandinê hez dikim. Ez ji kurd û tirkan jî zêdetir, ji nivîsandinê hez dikim. Ez dinivîsim û fikrên xwe jî tînim zimên. Ku ji min re were gotin, "ji bo xelaskirina welatê xwe tuyê dev ji nivîsê berdî û bazdî virde û wirde", na. Ezê pirtûkên xwe binivîsim. Her kes bila karê xwe bike. Yaw! Ez 46 salî me. Eger bi nivîsandinê, wezîfeyên ku li ser milên min in ez pêk neynim û vê, bi bedena xwe jî bixwazim temam bikim, wê çaxê tê maneya ku di nivîskariya min de kêmasî hene. Bi rastî jî kêfa min ji vê yekê re jî nayê. Ev, wê nîşan bide ku, ez karê xwe baş pêk naynim.

Ez dinivîsim. "Na. Ne bes e! Here qîran jî bide." Na, ezê neçim qîran nedim. Eger ez bi nivîsandinê karê xwe baş pêk bînim, ezê dengê xwe jî bidim bihîstin. Yanê ezê ji nivîsên xwe fedekariyê nekim. Li Tirkiyeyê 65 milyon însan hene. Eger wezîfeya mîlîtaniyê jî gerek bike, kesên ku vê hilgirin ser xwe jî hene.

Ez, ne beşdarî panelekê, ne jî civînekê dibim û nivîskarên ku beşdar jî dibin, bi rastî jî ez wan hinekî biçûk dibînim. Divê pêşî mirov karê xwe baş bike. Ku wisa nebe, dibe ku ev bibe şarlatineyeke cidî jî.

*Ji aliyekî ve dewlet bi awayekî resmî vî şerî wekî "şer" qebûl nake, lê şerekî germ û giran dimeşîne. Ji ber wê jî, tu kes ji jiyana xwe ne memnûn e. Ev rewş wê çawa biguhere?*

– Min du roj li ser hev nivîs nivîsandin di quncikê xwe de. Do û îro (25–26'ê Avrêlê, Yeni Yüzyıl). Bi giştî xwendevanên min, ji min vî tiştî dipirsin: "Ê temam, tu her tim me dawetî hereketê dikî, da ku em demokrasiyê bînin vî welatî, lê emê çi, çawa bikin?" Pêşniyaza min ev e: Îro ew partiyên ku di navika siyasetê de ne, tu tişt ji wan dernakeve. Ew nikarin bibin çare ji Tirkiyeyê re. Ew bi temamî bi sîstemê ve girêdayî ne. Ne enerjiya wan a ji bo xelaskirina vê sîstemê, ne jî niyeta wan heye. Di nav vê sîstemê de ji bo alîgirên xwe hewl didin ku parekî mezin bidizin. Ji xeynî vê jî tu pevçûna wan nîn e. Lê belê îro xwedî fikrên cihêreng li derveyî parlementoyê, partî û rêxistinên ku xwedî parîteyên hevpar mîna aştî û demokrasiyê ne, hene. Ev kî ne? Mesela; Partiya Demokrasiya Nû (YDH), Partiya Piştgirî û Azadiyê (ÖDP), Partiya Nû (YP), Partiya Lîberal (LP), HADEP, Platformên Demokrasiyê û gelek platformên bi vî rengî. Ji xeynî van sendîka, mîna DİSK, Hak–İş, belkî Türk–İş û ew kesên ku karsaziyê dikin.

Li ser nivîsên min ên ku min du rojan weşandin jî, mesela DİSK, Hak–İş, TÜGİAD, MÜDİAD daxuyandin ku wê piştgirî bidine vê hereketê. Eger rêveberên van partiyan xwe nexin nav tewreke kariyerîst, mîna "wê kî bibe rêber, wê kî bi rê ve bibe û hwd.", di vê dema acîl de ji bo ku li Tirkiyeyê hêviyek biafirînin, ez bawer dikim ku di sehneya siyasetê ya Tirkiyeyê de wê guherînên giring pêk werin. Çare ev e li gorî min.

*Li ser pêşniyaza we ya di wê nivîsê de daxuyaniya partî û rêxistinan, yên ne alîgirê lihevhatinê hebûn. Mesela ÖDP...*

– Belê ÖDP xwe zêde nêzîk nake. Ji ber ku di nav ÖDP'ê de kesên kemalîst hene û li gorî ku ez dibînim ÖDP naxwaze wan ji destê xwe derxe û wan winda bike.

*Mesela komeleyên karsazan jî mîna TÜGİAD, MÜDİAD jî dîtinên cihêreng danîbûn holê. Wekî ku vê sîstemê bidomînin û ...*

– Vêga binêrin! Mirovek ku binivîse, li gorî aqlê xwe tiştê herî rast datîne holê û wê pêşkêş dike. Li gorî aqlê min jî tiştê herî rast ev e. Qedera civakan jî heye mîna ya însanan. Xwedê vê qederê nanivîse, tespît nake; enerjî, dînamîzm, hêz û her tiştê wê civakê, qedera xwe tespît dike. Eger ev civak nehatibe wê merhaleya ku refleksên xwe nîşan bide, hûn gotinên herî biaqil ên dinyayê jî bibêjin, ji vê, an jî ji wê sebebê, ev kar pêk nayê.

*Ev mimkun e gelo li gorî we?*

– Tabî. Ev partî ne tenê ji rêveberan pêk hatine. Mirovên din jî hene di wan partiyan de. Eger aqlê wan însanan pê bigihîje û ku zorê bidin rêveberên xwe, wê ev guherîn pêk were.


*Heta vêga çima çênebû? Kesî negotibû gelo?*

– Em li Tirkiyeyê 65 milyon însan in lê, kalîteya însanên me zêde ne bilind e. Ji ber wê jî tiştên ku her tim li aqilan tê, wekî rastiyê dernakevin holê. Mesela hin kes zehf demokrat in, lê îlla serê xwe bi rêbertiyê re diêşînin, an jî dixwazin bibin rêveber, yanê aliyê wan ê kariyerîst heye. Ê, ev jî li welatên paşmayî gelekî mimkun e. Vêga wext jî musaît e û li ber me mînaka Îtalyayê ku cesaretê dide însanan, heye. Êdî di vê tengasiyê de çareyên acîl lazim in. Ev îtîfak bi kapîtalîstan re jî dikare bê çêkirin. Çunkî îro ew jî musaît in ku piştgiriyê bidin hereketeke demokrat.

*Di 15'ê Berfanbara 1995'an de, ji aliyê PKK'ê ve agirbesteke yekalî hate îlankirin. We der heqê vê mijarê de, tiştek nenivîsand. Gelo ev ne gaveke cidî ye ji bo çareseriya probleman?*

– Min li ser vê mijarê hîç nenivîsand û ez nanivîsim jî. Çima? Em ji du aliyê biçek behs dikin. Dema çek bipeyivin, di navbera kesên ku sîlehan didin peyivandin de, tu karê ku ez bikim nîn e. Tiştekî ku bi dest min nakeve, lê ya wan heye û bi wan tiştên xwe ketine nava hev û şer dikin. Ji xeynî vê, îro Başûrê Rojhilat (mebest ji Kurdistana Bakur e) di wî halî de ye ku bi rastî jî ez nizanim çi, çi ye û kî jî çi ye. Başûrê Rojhilat ji wan cihên ku herî feqîr û xizan ê Tirkiye û herêmê ye.

# ...bêaqil birçî dimînin'



Lê ez vê dizanim ku, gelek pereyên Tirkiyeyê li kolanên Başûrê Rojhilat diçin. Narkotîk û qaçaxiya sîlehan, ez dibînim ku bi awayekî bêkontrol, li çiya, deşt, kolan û qehwexaneyan tê kirin. Ha, van pereyan kî dîstine, çawa distîne, ez van nizanim. Li Tirkiyeyê kes jî der heqê vê yekê de ne xwedî agahiyên baş in. Yanê li wê derê ji bo rêxistinan pere tên civandin û her wiha ji ber sebebên cihê cihê jî. Kes nizane ev pere diçin ku derê. Vêga însan ku bikevin dirûvên (şekl) hev û din û pere bicivînin, haya kesî wê jê çênebe. Ew kesên ku pereyan dicivînin bi kîjan armancê dicivînin, ji bo hesaba xwe ya şexsî bi kar tînin, ji bo îşekî din bi kar tînin, ji nav dewletê jî, kesên vî karî dikin hene, ji aliyê din jî hene gelo? Der heqê van de tu agahiya min nîn e.

Tenê du aliyên biçek hene û ew jî sîlehên xwe didin xebitandin. Eger ku ez tiştekî bibêjim, bi gotineke leşkerî "qiymeta harbiyeyê" namîne. Dema sîleh hebin wê dengê me neyê bihîstin. Emê dengê xwe bigihîjînin wan kesên ku sîleha wan nîn e. Ez îro derdê xwe ne dikarim ji wan kesên ku li Enqereyê alîgirê sîlehan in re bibêjim, ne jî ji PKK'ê re dikarim tiştekî bibêjim. Ez derdê xwe, li Tirkiyeyê li nav welatiyên ji her nîjadî, mirovên demokrat jî hene, ku ez karibim ji wan re ezê bibêjim.

*Madem wisa, divê çi bê kirin? Ma ne gerek e ku mirov tiştekî bibêje ji her du aliyan re jî?*

– Vêga ji PKK'ê re tiştekî ku ez bibêjim zêde nîn e. Ancax dikarim ji dewleta tirk re bibêjim. Çima? Ez xwediyekî dewleta tirk im. Ez dikarim jê re bibêjim ku, "Dixwazim li vî welatî aştî hebe, demokrasî û hiqûq hebe." Lê ezê ji PKK'ê re çi bibêjim? Çi têkiliya min heye pê re? Ji PKK'ê re "Di nav hiqûqê de bilive" ezê bibêjim? Kîjan hiqûq? Armanca me ya tevan ew e ku zarokên me baş bijîn. Îro ez ji mantiqa "ji bo ku zarokên me baş bijîn, ez li zarokan dikujim" jî bawer nakim. Ez dema leşkerên dewleta xwe ji ber ku gundan dişewitînin protesto bikim, dema PKK'ê here gundan bişewitîne, ez vê nikarim bipejirînim.

*Lê belê ev 5 meh e ku PKK'ê, yekalî agirbest îlan kiriye. Esas hûn vê çawa dinirxînin?*

– Vêga ez bi kûrahî ji wê ne haydar im. PKK cara din jî şer rawestandibû, dû re jî çû 33 leşkerî di nav otobusekê de şewitand û kuşt. Tevî min, di dema agirbesta yekemîn de gelek kesan nivîsandin, lê belê 33 zarokên ciwan, hem jî ne li meydana şer, ji bajarekî diçûn bajarekî din, di nav otobusê de ku PKK wan bikuje, ezê careke din çawa li ser agirbesta ku PKK'ê îlan kiriye, bisekinim? Ez bi awayekî eşkere bibêjim ku li Tirkiyeyê tu kes der heqê agirbesta PKK'ê de nikare tiştekî erênî bibêje, piştî wê bûyerê. Eger em bibêjin; "gelekî baş bû", piştî heftiyeke din PKK'ê ku dîsa here zarokên ciwan bikuje, wê çawa çêbe? Êdî kesek careke din nikare bikeve bin berpirsiya kuştina 33 zarokan. Ne berpirsî be jî, ji aliyê wijdanî ve kes nikare bikeve binê vî barî. Pê bawerîdayîna însanan gelekî zehmet e, lê ji holêrakirina wê jî gelekî hêsan e. Tiştê ku ez fêm dikim PKK dixwaze cidî were girtin. Lê belê ji bo ku cidî were girtin, divê cidî jî hereket bike.

*Ez dixwazim bala we bikişînim ser tewra dewletê ya ji bo xerakirina agirbestê.*

– Li ser vê yekê tu agahiya min nîn e. Li ser mijarên ku li Başûrê Rojhilat diqewimin, zêde fikra min nîn e. Ji ber wê jî ez tenê agahiyên giştî dibêjim.

*Li gorî we gerek nake ku dema mirov tiştekî binirxîne, li ser mijarê jî xwedî agahiyên baş be?*

– Ez tenê li ser nasnameya kurdan, li ser mafên welatiya kurdan behs dikim. Lê, li ser PKK'ê tu daxuyaniya min nîn e. Ez nizanim PKK çi ye û çi jî dike. Têkilî jî çawa ne, ez nizanim.

Li gorî min ev mesele ne meseleya PKK'ê ye, meseleya kurdan e, her çiqas dewlet vê meseleyê mîna meseleya PKK'ê nîşan bide jî. Ew mafên min ên ku, ez bi zimanê dayika xwe, an jî (tê îdiakirin ku diya min kurd e), bi zimanê bavê xwe dipeyivim, dinivîsim, televîzyonê seyr dikim, perwerdehiya xwe dibînim, rojnameyan derdixim; ew maf ya kurdan e jî li gorî min. Heta radeyekê, ev tişt wê meseleyê çareser bikin. Yanê ez ji mafên wan ên demokratîk behs dikim. Beriya PKK'ê jî pirsgirêka kurdan hebû. PKK'ê ji binî ve ji holê rakin jî, wê meseleya kurdan her hebe.

*Li hemberî gelê kurd, polîtîkayên nemafdar tên meşandin, ji ber ku gelê kurd mafên xwe dixwaze. Kurd xwe mafdar dibînin, gelo ji aliyê rewşenbîrên tirk û gelê tirk ve çawa tê dîtin?*

– Bi giştî rewşenbîrên tirk her hal ew jî vê yekê mafdar dibînin û ez zen nakim ku welatiyên tirkan zêde serê xwe pê re biêşînin. Lê hêdî hêdî, fikra nîjadperestiyê di serê însanan de, gerek di yê tirkan, gerek jî di yê kurdan de zêdetir çêdibe. Vêga ku hûn ji min bipirsin, tirkbûn jî, kurdbûn jî, fransizbûn û îngilîzbûn jî tiştekî di eynî radeyê de, xerîb û sosret e. Eletewşiya nîjadperestiyê ew e ku, ji taybetiyên xwe yên ji zayînê bi dest xistiye, pesnên xwe dide. Di nav parçeyeke demê ya jiyanê ya ku ser û binê wê tarî ye de, kirin û afirandina însanan muhîm e.

Lê Tirkiye ji ber ku welatekî paşmayî ye, însanên wê jî, xwe bi nîjad û dînê xwe tarîf dikin. Jixwe problem jî, ji wir dest pê dike. Ev munaqeşeyeke gelekî hoveber e; munaqeşeya kurd û tirkîtiyê. Lê em di nav vê hoveberiyê de nema dikarin tiştekî bikin, em bi xeniqandina hev û din re meşgûl in.

Ha, tirk li ser vê meseleyê çi difikirin? Nizanim. Her hal hin kes xwe efendiyên vê derê dihesibînin û dibêjin "kurd çi kes in îca?" Hin kurd jî derdikevin dibêjin "Ev du hezar sal e ku em li vê derê ne, ev çi kes in îca?" Ji ber vê yekê jî şer çêdibe, xwîn diherike, zarok dimirin û êş tê kişandin.

*Her çiqas fransiz, îngilîz, kurd û tirkbûn nemuhîm be jî, di encamê de ji kurdan re tê gotin ku, "nebêjin ez kurd im."*

– Hah, ez jî wê dibêjim jixwe. Kî bixwaze bila bibêje "ez kurd im." Bi lêdanê ku tu bixwazî bidî qebûlkirin ku ew ne kurd in, ma tu mantiqê vê yekê heye?

*Lê hûn dibêjin ku, însanek dema ji xwe re bibêje "ez kurd im", ev hoveberî ye. Di demeke wisa de...*


– Ev hoveberî ye tabî. Ev, ji hoveberiyeke din derdikeve holê. Ha! Wisa jî nefikirin; yanê dewleta tirk ji kurdan re dibêje "îlla hûn tirk in", ew jî dibêjin "Na! Em kurd in!" Li vê derê kurd mafdar in, ji ber ku li dijî zordariyê derdikevin. Lê mafdarbûna kurdan, rastiya hoveberiya herduyan naguherîne.

*Kurd ji bo nîjada xwe şer dikin gelo? Mesele kurdbûn e?*

– Taybetiyên xwe dixwaze. Mafdar e jî, lê min gotibû mafdarbûna wan, rastiya hoveberiya vî şerî naguherîne. Yanê kurd û tirk hê li ser çîpên ku li kompîturan tên bikaranîn, rekabetê nakin, pev naçin. Şerê di navbera kurd û tirkan de mîna krîza Kardakê ye. Hindik mabû ku li ser Kardakê yewnan û tirk bi hev bikevin. Temam, aliyek mafdar bû, lê di encamê de ev pevçûn rastiya hoveber û eletewşiya vî şerî naguherîne. Eger li welatekî tu li însanan gotina "ez kurd im" qedexe bikî û ew welat di nav xwînê de bimîne, ev şer şerekî hoveber e. Di vê civakê de, hem kurd, hem jî tirk lipaşmayî ne.

*Dûmahîk rûpel 15*

## Ahmet Altan



Di sala 1950'an de li Enqereyê çêbûye. Bavê wî tirk, diya wî jî li gorî hin gotinan kurdeke ji başûr e. Li gorî Ahmet Altan, Yaşar Kaya di Rojnameya Özgür Gündemê de gotiye ku diya wî kurdeke ji başûr e û heta, navê eşîrekê jî dabûye û bi pisên wî (kuzen) re jî peyiviye. Altan Tan jî bi qasî du salan berî niha, di programeke televîzyonê de jê re gotiye: 'Em pisên hev û du ne', li hemberî pirsa wî: "Tu ji ku derdixî", Altan Tan jî dibêje: "Diya te kurd e'. Ahmet Altan, gelekî şaş dibe. Lê zêde bi dû vê meseleyê neketiye. Ahmet Altan, li Fakulteya Îktîsadê ya Stenbolê xwendiye; di 18 saliya xwe de zewiciye. Du zarokên wî hene. Di 24 saliya xwe de li Ajansa Associated Press'ê, dest bi rojnamegeriyê dike. Piştî wî, li rojname û kovarên mîna; Hürriyet, Güneş (jê hatiye avêtin), Milliyet (jê hatiye avêtin) û Noktayê de xebitiye. Li televîzyonê jî, ev program çêkirine; Inter–Star: Kırmızı Koltuk, Kanal D: Kampana û Atv: Son Celse. Programên Kampana û Son Celse, ji aliyê rêveberên wan kanalan ve, ji weşanê hatine rakirin. Heta vêga 4 pirtûkên wî derketine: Dört Mevsim Sonbahar, Sudaki İz, Yalnızlığın Özel Tarihi, Geceyarısı Şarkıları, Tehlikeli Masallar (wê di nêzîk de derkeve). Çend heb doz der heqê wî de hatine vekirin. Hin xelas bûne, hin ji wan jî, hê li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) dewam dikin.

www.arsivakurdi.org

# Hawarek ji kurdên dûrxistî

**Hawar, weşana yekêmîn e ku bi alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî derketiye; hem jî li xerîbiyê. Di ser wê re tam 64 sal bihurîne, lê hîna jî tezebûna xwe dihêvişîne.**

ZANA FARQÎNÎ


Hawarê, di 15'ê gulana 1932'yan de li Şamê olan da. Xwediyê wê, hîmdarê alfabeya kurdî ya latînî Celadet Bedirxan bû, ku ew neviyê Mîr Bedirxan, Mîrê Cizîra Botan ê dawî bû.

Ji ber ku malbata bedirxaniyan li ber dewleta osmanî rabûbûn û gelek serhildanên kurdan organîze kiribûn, ji hev hatibûn bela–welakirin û ji cih û warên xwe hatibûn sirgûnkirin.

Celadetê kurê Emîn Elî Bedirxan, li Stenbolê li paytexta osmanî ji dayika xwe bûbû. Digel vê rewşê, hem hêvotineke baş dîtibû û hem jî di warê siyasî de xwe baş gihandibû. Dayika Celadet çerkez bû, lê wî bi erebî, farisî, tirkî, almanî, yewnanî, fransizî, îngilîzî û bi kurdî dizanibû.

Heta dema ku Celadet Bedirxan Hawarê li Şamê derdixe, bi meseleyên siyasî û doza gelê xwe re jî bi awayekî çalak (aktîf) mijûl dibe.

Ew di 25.08.1930'yî de diçe Şamê û digel Haco Axa (kurên wî Hesen, Çeçan, Cemîl) Qedrî, Ekrem û Mihemed Cemîl Paşa, Hemzeyê Muksî di mala Elî Axayê Zilfo de bi cih dibin; li Taxa kurdan. Ew kes tev endamê "Civata Xweybûnê" bûne. Ev rêxistin, di sala 1927'an de li Beyrûdê tê damezirandin û di Serhildana Çiyayê Agiriyê de roleke mezin û girîng leyîstiye.


HAWAR

KOVARA KURDÎ • REVUE KURDE


Piştî têkçûna serhildanê, kurdên ku ji welatê xwe hatine dûrxistin, dest diavêjin kar û xebatên li ser çanda kurdî, xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî. Bi destek û alîkariya wan rewşenbîr û pêşengên kurdan, Celadet Bedirxan weşana yekemîn ku bi alfabeya kurdî bi tîpên latînî derdixe, bi navê "Hawar"ê. Mêjûya derketina hejmara pêşin, 15.8.1932 ye. Piştî Mîqdad Mîdhet Bedirxan dikare wekî hîmdarê duyemîn ê rojnamegeriya kurdî bê qebûlkirin. Di encama 11 salan de 57 hejmar dikarin bikevin destê xwendevanan. Hawar heya hejmara 26'an li dû hev dertê û di 18'ê tîrmeha 1935'an de navberê dide weşana xwe. Di nav sedemên derneketina wê de, digel merc û şertên siyasî, rewşa aborî û kêmbûna xwendevanan xwe didine pêş.

Wê demê, fransiz li Sûriyeyê hikûmran bûn. Hawar bi riyên nehênî (veşarî) ketiye bakurê welêt. Xwendevanên wê yên din, kurdên sûrî û kurdên herêma Behdînan bûne. Nivîs ji wan herêman hatine û di nav xwenedevanan de axa, feqî, rencber, cotkar û şivan jî hebûne. Hêja ye ku bê gotin: Celadet Bedirxan ji xwe re şagirt jî gihandibûn: Kamuran Bedirxan, Osman Sebrî (Apo) û Qedrîcan. Alîkariya wan kesan jî pir gihîştiye Mîr Celadet.

Ji hejmara pêşîn heta ya 23'yan, digel tîpên latînî, cih daye tîpên erebî jî. Ji aliyê din ve jî, hin guherîn di warê rastnivîsê de hatine pê. Tîpên 'ê'û 'î' êdî nema hatine pêşiya tîpa 'y'ê. Her wiha 'û' jî nehatiye pêşiya "w" yê.

Digel vê yekê piştî hejmara 23'yan, tîpên 'Q' û 'K' cih bi hev guhertine. Di cihê dengê 'Q'yê de berê 'K' û di yê 'K'yê de jî 'Q' hatiye bikaranîn. Ev rewş jî, bi pêşniyaza Elî Seydo Gewranî diqewime. Mîr Celadet di hejmara pêşîn a Hawarê de alfabeya xwe bi pênc zimanan dide naskirin; kurmancî, farisî, tirkî, erebî û fransizî.

Piştî ku Şerê Cîhanê yê Duyemîn diqewime û îngiliz dikevine Sûriyeyê, rewşeke nû derdikeve holê. Îngiliz nêzîkiyeke germ di kurdan didin. Keys û derfetên derxistina Hawarê, ji nû ve, çêdibin. Ew destûr didin ku li Lubnan û Ammanê berhemên bi kurmancî û kurmanciya jêrê (soranî) derkevin.



Rayedarên îngiliz ên li herêmê alîkarî didine Celadet. Kaxizan didinê, ku di wê heynê de bidestxistina kaxizan pir dijwar bûye. Celadet kaxizên zêde di "Sûka Reş" de difiroşe û pere ji bo derxistina "Hawara Kurdan" peyda dike. Di 15'ê gulana 1941'ê de car din Hawara kurdan olan dide û hejmara 27'an derdikeve pêşberî xwendevanan.

Hawar, hejmara xwe ya dawîn a 57'an, di 15'ê gelawêja 1943'an de diweşîne.

Ji aliyê hejmara rûpel û vedorê (peryodê) ve rêkûpêkiyek nîn e. Carinan 16 rûpel, carinan jî 10 rûpel derketiye. Ji bo ku ramaneke zelal bide eleqedaran, min divê ku ez çend hejmaran li gorî derketina mêjûya wan pêşkêş bikim.

*Hejmar 24: 1 Nîsan 1934*
*Hejmar 25: 19 Tebax 1934*
*Hejmar 26: 18 Tebax 1935*
*Hejmar 27: 15 Nîsan 1941*
*Hejmar 28: 15 Gulan 1941*
*Hejmar 29: 10 Hezîran 1941*
*Hejmar 20: 1 Tîrmen 1941*
*Hejmar 31: 1 Tebax 1941*
*Hejmar 32: 1 Îlon 1941*
*Hejmar 33: 1 Çiriya Pêşîn 1941*

Me navê mehan wekî eslê wan hişt. Ji wan hejmaran jî dixuye ku çi dema derfet hebûne, Hawar wekî mehane derçûye. Celadet Bedirxan wê demê, kovareke hefteyî, bi wêne jî derxistiye, bi navê "Ronahî"yê. Hejmara wê ya pêşîn di 01.03.1942'yan de derketiye. Ew jî tevîhev 28 hejmar derketiye.

Em di nav rûpelên Hawarê de rast li navên kesên ku alîkariya aborî jî dane wê, tên. Çawa ku îro jî kurd bi îmkanên xwe li ber xwe didin û têdikoşin ku weşanên xwe derxin û bigihînin xwendevanên xwe, wê rojê jî wisa bûye.

Divê em piçekî jî li ser naveroka Hawarê jî bisekinin. Hawar, bêwêne derketiye. Gelek mijar tê de hene. Ji zargotina (folklora) kurdî heta bi edebiyata nivîskî ya kurdan a klasîk, ji dîrokê heta bi cografyayê, ji wergerê heta bi nûçeyên Şerê Cîhanê yê Duyemîn. Ji gramera kurdî heta bi mijarên din.

Wekî gotina dawî mirov dikare bibêje ku Hawar bi kurmanciya xwe ya xweş û xwerû ansîklopediyeke miletekî bindest e ku hebûna wî hatiye înkarkirin, rê li ber vejîna zimanê wî hatiye girtin û qedexekirin. Îro jî vê weşanê tu tişt ji qîmeta xwe winda nekiriye.

## Helbestvanê kurd Hamîd Bedirxan mir

Helbestvanekî hêja û mezin ji nav me koç kir. Helbestvanê kurd ê bi nav û deng Hamid Bedirxan, 28'ê avrêlê li Sûriyeyê, di 72 saliya xwe de, çû ser dilovaniya xwe.

Bedirxan, ji gundê Şiyê yê bajarê Efrînê bû. Wî bi taybetî li Sûriyeyê bi helbestvaniya xwe gelek deng dabû. Heta vêga 2 dîwanên wî bi zimanê erebî derketine. Ji xeynî zimanê erebî, bi zimanê kurdî, tirkî û fransizî jî gelek helbest nivîsandine.

Hamid Bedirxan, ne tenê kurd û bi zimanê kurdî re eleqedar bûye, wî bi xwe înternasyonalîzm parastiye. Heta di Rojnameya Welat, hejmara 88'an de nivîskar Dilbixwîn di nivîsa xwe de ji axaftina xwe ya bi Bedirxan re, behs dike:


Min jê pirsî (ji Hamid Bedirxan): "Tu ji vir diçî, li Afrîkayê, li nexweşekî digerî ku li ser helbesteke binivîsî, lê hema kuştiyên Kurdistanê nabînî, çima?" Bersiv da: "Ji ber ku ez bi kuştiyên Kurdistanê re tême kuştin..."

... Piştî ku nîvê şevê derbas bû, wiha gote min (H. Bedirxan): "Kurdayetiyê pir nedin pêş, hûn ciwan in, li ser înternasyonalîzmê bisekinin."

Bedirxan li Sûriyeyê, tevî helbestvaniya xwe, bi dostaniya Nazım Hikmet jî dihat naskirin.

**Azadiya Welat/Sûriye**

## ÇALAKÎ



Li NÇM'ê vê heftiyê ev çalakî hene.

● **12.05.1996 Yekşem:** Teatra Jiyana Nû: Lîstika Rojbaş, saet: 14.00 Konsera Mazlum Çimen, saet: 18.00

● **15.05.1996 Çarşem:** Semînera Faik Bulut: "Koçberiya kurdan", saet: 18.00

● **17.05.1996 În:** Beşa NÇM'ê ya Dîtbariyê, Filmê Eisentein "Kewçêr", seat: 14.00

● **18.05.1996 Şemî:** Vebûna pêşengeha wêneyên Recep Maraşlı, saet: 14.00, Bernameya bîranîna 18'ê gulanê, saet: 14.00, Teatra Jiyana Nû: Lîstika Rojbaş, saet: 18.00

Li BEKSAV'ê vê heftiyê:

● **12.05.1996 Yekşem:** Bîranîna Roja Dayikan: Dayikên di romanê de, dayika kurd, dayika tirk, dayika femînîst, dayika hunermend, dayika windabûyan, dayika sosyalîst, axaftin, saet: 15.00, Konsera Koma Rocka Kurdan "Rê ji rovî revî, Rovî ji rê revî", Saet: 19.00

● **18.05.1996 Şemî:** Li ser pirtûk û helbestan axaftin, Ahmet Okay, saet: 15.00, Konsera "Ros Pasaros Sefardadis", saet: 18.00

Li NÇM'ya Îzmîrê jî ev çalakî hene:

● **12.05.1996 Yekşem:** Belgesela Yılmaz Güney û bi Ahmet Soner re gotûbêj, saet: 18.00

● **17.05.1996 În:** Konsera Hakan Tosun, saet: 19.00

● **18.05.1996 Şemî:** Panel "Jin û Ceng" amadekar Ayşe Nur Zarakolu

## RÛDAN

# Lehengan li Çiyayê Agirî dîrok nivîsîn lê...

Di dîroka her gelî de rojên serkeftinê, rojên azadiyê, rojên têkçûnê hene. Lê ne wekî dîroka kurdan e, ku di her serhildanê de bi xayîntiyên mirovên xwe têk çûye. Em li dîroka kurdan dinihêrin, ger bi qasî serhildanên ku kirine yekîtiyeke wan hebûya, wê di serhildana sala 1806'an ku Babanzade Abdurahman Paşa kiriye de bigihîştana azadiya xwe.

Piştî Serhildana Qoçgirî, Şêx Seîd îcar serhildaneke ji herduyan berfirehtir û ji aliyê dîplomasiyê û rêxistîbûnê ve xurtir daye destpêkirin. Baweriya gelek kurdan û serokên kurdan ji nû ve dibû, ku wê ev serhildan azadiyê bîne lê..

Di kewçêra 1927'an de li Lubnanê hêzên kurdan yên ji rêxistinên Xoybûn, Azadî, Cemiyeta Bilindkirina Kurdistanê, tevî serokên eşîrên bi navûdeng, axa û began civîneke ku çil rojî dom kiriye çêkiribûn. Piştî wê civînê di navbera hêzên kurdan de yekîtî çêbû. Wan, ji bo şoreşeke ku îcar ji kurdan re azadiyê bîne, dest bi xebatê kirin.

Dema ku civînê dom dikir, eşîrên li Kurdistanê cih bi cih li hemberî dewletê serî hildabûn û şer dikirin. Piştî civînê, îradeya ku çêbû, Îhsan Nûrî Paşa wekî serokê Artêşa Rizgariya Kurdistanê tayîn kir. Biro Heskî Têlo jî li herêmê ji bo ku rêxistina gel pêk bîne û karê siyasî bimeşîne wezîfedar bûbû. Di warê dîplomasiyê de jî bi ermeniyan re peyman hatibû çêkirin. Li ser vê peymanê jî sondek bi tevayî kirine ku wê heta dawiyê ji bo Kurdistaneke azad têbikoşin.

Li hêla din Xoybûn jî, ji ber ku penaberên kurd ku ji Tirkiyeyê hatine bidûrxistin dewletên wekî Îran, Iraq, Sûriyeyê qebûl kirine û dewletên wekî Fransiz, Îngiliz jî ji ber ku piştgiriyê didine Xoybûnê niyetên xwe yên baş pêşkêş kirine. Ji bo ku rojekê di pêş de dewleta tirk kurdan binase, daxwaza piştgiriyê dikir ku ji aliyê dîplomasiyê ve bidine wan.

Birêxistina Xoybûn ji hêlekî ve ji bo ku gelê kurd bi tevahî beşdarî serhildanê bibe dixebitî, ji aliyekî ve jî bi weşanên xwe kirinên dewleta tirk ji bo ku di qada navneteweyî de bide zanîn xebat dikir.

Di vê navê de Îhsan Nûrî Paşa bi artêşa xwe êrîşî ser qereqolên tirkan dikir, çekên wan bidest dixistin û şer berfireh dikir. Hêzên tirkan ketibûn tengasiyeke pir mezin. Lewre jî qanûnên poşmaniyê derdixistin, ji bo kesên wekî serok têne nasîn. Yanê heke ew teslîm bûbûna wê bihatana efûkirin. Bi hewla waliyê Bazîdê û Mufetişê Herêma kurdan Îbrahim Tali, pêşniyazeke bi vî rengî ji Îhsan Nûrî paşa re tînin. Heta tê gotin ku li ku derê bixwaze, wê meqamekê bidinê, lê Îhsan Nûrî wiha bersiv dide wan: "Ez Fermandarê Artêşa Rizgariya Kurdistanê me, ev wezîfe, Xoybûnê daye min, ancax ew dikarin min ji vê wezîfeyê bigirin. Heke daxwazên we ji aliyê dîplomasiyê ve hebin, ez dikarim bigihînim Xoybûnê, Xoybûn di vî warî de karbidest e."

Şoreş her roj geş dibû, ji aliyekî ve kurdên Sûriyeyê, ji aliyekî ve jî kurdên Kurdistana Başûr êrîş dibirin ser mifrezeyên tirkan. Serhildan li Erziromê, Wanê, Qersê, Sasonê, Culemêrgê heta gihîştibû Cizîrê. Dewleta tirk jî her roj leşker dişandin herêmê. Êdî hewldaneke dawî mabû ku şoreşê bigihînin encamê, lê hin eşîrên kurdan piştgiriya xwe ji şer paşve dikişînin. Dîsa dewletên wekî Îran û Sovyetê ku piştgirî didane serhildanê, piştgiriya xwe ji paş ve dikişînin; nahêlin kurd bikevin nav axa wan. Berevajî vê yekê rê da ku artêşa tirk derbasî nav erdê wan bibe.

Serhildana ku bi vî awayî dest pê dikir, bi xayîntiyan û bi alîkariya dewletên wekî Îran û Sovyetê ku dan Tirkiyeyê, têk çû. Lê kurdan negotin bes e, gotin: "Ev nebe emê di yeke din de bi ser bikevin."




**Kumandarê Serhildana Agirî, Îhsan Nurî Paşa û Yaşar Xanim.**

METÎN AKSOY

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



### Stran û helbest

Lay hemwan aşkira ye ke, mêjûy edebiyatî kurdî, mêjûyekî tije be efrandinî helbest e û le naw ew baxçe pir le guley şîir da, gulîlkî ewende geşî tê daye ke, awêtey awazî be soz bikrêt û le cwantirîn berig da û pêkewe bibin be mîwanî dîwexanî hunerî kurdî.

Le amêzî xermanî şîirî ême da, çepke wişey ewende nasik û xoşawaz hen ke, hawşanî mosîqay resen û nayab pêm wabê newbûkî xoşiktirîn goranî dexemlênin.

Bêguman ger çawêk be sercem biwarekanî çandîman da bigêrîn, hîçiyan şan le şanî şîir naden û le gelî da helnaken, diyar e eme giftûgoy taybetî le sere û mijarî êreman niye. Belam witey mebest lêre da ye ke, aya bo hunermendanî kurd, ewaney sergermî çêkirdinî stranî kurdîn û dexwazin be cwantirîn şêwe ew hunere nasike pêşkeş be gwêgirî kurd biken, boçî sûd lew xermane be bereketey helbestî kurdî wernagrin û boç nayken be hewênî dahênanî gewre!?

Hunermend û goranîbêjanî kurd ke nayen ewe biken, ewe niye bê dengane xoyan lew base bikêşinewe, na. Belkû dên biyanû bo ewe dehêninewe ke, şîirî kurdî yan bo awaz nabêt (diyar e hemû şîirê kurdî nalên), yaxûd pêwîstî be deskarî kirdine û moletî ew deskarî kirdineş be giran be des dexen.

Serbarî emaneş ke hemû naheqîn û le şîirî kurdî dekrên, goranîbêjan pena weber nûsînî şîir deben, ke le zorbey barekan da, helbestî ewende lawaz û na cor denûsin, ke natwandrêt berawird bikrêt le gel ew helbestaney ke ewan pêyan waye kirasî awaz be beryan nakat.

Le naw ew şîirane da, ke le ser destî goranîbêjan hatûnete nûsîn, ewende nimûney lawaz hen ke mirov le astiyan da şaş demênêt. Diyar e em kolane tengebere biwarî le ser westanî ew mijarey têda niye, dena mirov dikare zor nimûney corawcor bidat.

Diwa şit demewê ewe bilêm û le goranîbêjan bipirsim; To bilêy şaîrî le Nalî, Cizîrî, Goran, Şêrko, Peşêw û Helmet gewretir hebin û le birî şîirnûsîn xoyan be goraniyewe serqal kirdibêt û le mêjûy şîirî kurdî da nawiyan bikrête jêr lêwewe!?

Birayine; Bawertan bê, eger xo sax kenewe xastir e. Yan goranîbêj bin, yan şaîr..

www.arsivakurd.org

# Pêkanîna derewan

**Wê rojê ez jî li nêçîrê bûm. Birayê min bi dûrbînê li bizinê dinihart. Bizin li ser kevirî nivîstibû. Wextê birayê min sêhra xwe lê girt, tiliya xwe kêşa tetîkê, bizinê lingê xwe rakir û çavê xwe xwirand. Wexta tivingê got teq, ling bi çavê bizinê ve bû. Ji ber hindê tiving bi lingê wê, şaxê wê, guhê wê û çavê wê ket.**

Wextekê du bira hebûn. Yek her dem rastiyê dike. Ewê dî hemû karê wî derew bûn. Her gava ku diçû cem hakim, derewek dikir û sed zêr distand û dihat eyalê xwe xwedî dikir. Ew birayê ku rastî digot, gelek feqîr bû. Rojekê diçe nik birayê xwe yê derewkar û ev axaftin di navbera wan de derbas dibe:

– Bira xulam; ka tu çi dibêjî hakim, ew hindek zêran dide te?

– Weleh ez dereweke dikim û sed zêran dide min û ez têm malê.

– Ez jî dê herim dereweke bikim, bila sed zêrî bide min. Ez hêjar im, pariyek nan li mala min nîn e.

– Bira, tu nizanî pêk bînî. Heger tu pêk neynî dê serê te bibire.

– Bira xulam, heke ez nikaribim pêk bînim, alîkariya min bike. Emê sed zêrên xwe bistînin ez û tu şirîkên hev.

– Baş e. De kerem bike, em biçin. Ezê ji bo te pêk bînim.

Her du bira diçin hizûra hakim. Silav didin civatê, civat li wan vedigerîne û ew jî li nav civatê rûdinin.

Hakim:

– Gelî civatê, hûn bi xêr hatin. Ka îro we çi dîtiye, çi heye, çi nîn e, bibêjin.

Rastgo:

– Hakimê min, min îro tiştekî ecêb dîtiye.

Hakim:

– Bi xêr be.

Rastgo:

– Ez çûbûm daran, min darên xwe lêkdan, hûr kirin, berê min li erdê, serê min çemandî bû.

Min berê xwe dayê, zûrezûra kuçikan ji ezmanan tê. Min çu tişt nedît.

Hakim:

– Gelî civatê, zûrezûra kûçikan çawa ji ezman tê?

Civat:

– Bi Xwedê hakimê me, ev tişt ji aqilan der e. Tiştekî wiha çênabe. Ezmanê Xwedê, cihê ferişteyan, cihê îbadetan e. Çi îşê kûçikê herimî li wir heye?

Hakim:

– Dêmek ev tişt derew e. Celad!"

Celad:

– Xêr e Hakimê min?

– Were serê vî zilamî jê bike. Wî dereweke ji xwe û bavê xwe zêdetir kir.

Birayê derewkar xwe avêt lingê hakimî û got:

– Hakimê min. Birayê min rast dibêje. Wexta birayê min dar hûr dikirin, çavê wî li erdê bûn. Ez jî nêzîkî wî sekinîbûm. Li piştê tiraşekê dêlikek teliqî bû. Kûçikên wê dêlê, bi ber wê tiraşê bûn.

Teyrek ji ezmanan hat, ji jor de xwe lê da û kuçikê rakir û fir da. Kûçik di nav lingên teyrî de bû. Teyrî kûçik dixwar û wexta nuklê xwe lê dida, zûrezûr ji kûçikî dihat. Birayê min kûçik nedît, min dît. Ji ber hindê zûrezûra kûçik ji ezmanan dihat.

Hakim:

– Gelî civatê ev çawa bû?

Civat:

– Hakimê me, weleh ev tişt rast e. Teyr hene kûçikan dibin, kevrûşkan dibin, kitikan dibin û di nav lingên xwe de li ezmanan dixwin.

Hakim:

– Sed zêrî bînin bidin vî zilamî. Wî tiştekî xweş ji bo me got.

Her du birayan sed zêr standin û derketin derve.

Birayê derewkar got:

– Bira, ez ne li wir bûma bi Xwedê hakim dê serê te jê bikira. Êdî ne derewan bike û tu nizanî pêk bînî jî.

Heyamek borî. Wan zêrên xwe xwarin. Birayê rastgo careke din ma bêzêr û bênan. Careke din çû nik birayê xwe yê derewkar.

– Ez xulamê te birayo, zêrên min xelas bûn. Eyal careke din ma birçî. Were em herin nik Hakimî. Ezê dereweke bikim, tu jî alîkariya min bike. Em şirîkên yek û du.

– Heger tu soz bidî min ku tuyê careke din derewan nekî, vê carê jî ezê alîkariya te bikim.

– Soz. Ez êdî derewan nakim.

Li ser vê gotinê her du bira çûn nik hakimî.

Dîsa silav dan û standin.

Hakim:

– Hûn bi xêr hatin. Gelî civatê îro we çi dîtiye, çi gule biye bibêjin.

Birayê rastgo dîsa dest bi gotinê kir:

– Hakimê min. Min îro tiştekî ecêb dîtiye.

Hakim:

– Xêr be?

– Ez çûbûm nêçîrê, bizinek nivîstibû, bizineke kûvî. Min tiving berdayê, bi lingên wê ket, guhê wê, şaxê wê, çavê wê hemû li gel hev avêtin.

Hakim:

– Gelî civatê, ev çawa çêdibe.

Civat:

– Hakimê me, weleh ev tişt bi aqilê me nakeve. Heger guh û şax û çav tenê bin, ev her sêk nêzîkî hev in, çêdibe. Lê ling û çav û şax û guh qet nabe. Ev tişt derew e.

Hakim:

– Celad were! vî derewek ji xwe û bavê xwe zêde kir; serê wî jê bike.

Birayê derewkar careke din xwe avêt lingên Hakimî û got:

– Hakimê min, weleh ev tişt rast e, bisekine ezê bibêjim.

Hakim:

– Kerem bike.

– Keremdar im. Wê rojê ez jî li nêçîrê bûm. Birayê min bi dûrbînê li bizinê dinihêrt. Bizin li ser kevirî nivîstibû. Wextê birayê min sêhra xwe lê girt, tiliya xwe kêşa tetîkê, bizinê lingê xwe rakir û çavê xwe xwirand.

Wexta tivingê got teq, ling bi çavê bizinê ve bû. Ji ber hindê tiving bi lingê wê, şaxê wê, guhê wê û çavê wê ket.

Hakim:

– Ka sed zêrên din jî bînin, bidin vî zilamî.

Wî nêçîreke baş û sohbeteke xweş kir.

Her du bira sed zêrên xwe standin û derketin. Êdî ew roj û ev roj, birayê rastgo tobe kir, da ku êdî derewan neke.



BERHEVKAR:
NEZİR DORAH/ENQERE

www.arsivakurdi.org

## *Ji dîroka rojnamegeriya kurdî*

# 'Roja Newe' û 'Şarkın Sesi'

**Kurdan çi dema fersend dîtine dest birine xwe û rojname, kovar û weşan derxistine. Lê çi hebûye ku komara kemalî tavilê derketiye pêşiya wan.**




Rojnameya Roja Newe, di 15.05.1963'yan de li Stenbolê pê diavêje warê weşanê. Rojname bi kurdî û tirkî derketiye û mehane bûye. Tê gotin ku ew rojnameya edebî, fikrî û siyasî bi tenê hejmarek derxistiye.

Dîsa, li gorî agahiyên ku Malmîsanij û Mahmûd Lewendî di pirtûka bi navê "Li Kurdistana Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908–1992)" de, didin zanîn ku Kendal Nezan di nivîsa xwe de (La Voie Noavelle) behsa Kovara Riya Newe jî dike. Îcar baş nayê zanîn ku ka her du eynî ne an na.

Navê rojnameyê bi zaravayê kirdkî (zazakî) ye û cara pêşîn wê cih daye nivîsên bi zaravayê kirdkî.

Nivîskarên wê pirtûkê didine xuyakirin ku Berpirsê Karê Nivîsaran ê Roja Newe Halil Kılıçkaya di 06.06. 1963'yan de hatiye girtin û ew şandine Girtîgeha Sultanahmedê; vê agahiyê jî, ji rojnameya Cumhuriyetê wergirtine.

Xwediyê rojnameyê Doğan Kılıç Şihhesenan, Berpirsê Karê Nivîsaran Halil Kılıçkaya û Mudirê Karûbarên Çapê yê Giştî jî Hasan Buluş bûye.

Ji aliyê din ve nimînendeyên (temsîlkarên) Roja Newe yê Amedê Abdurrahman Efhem (Dolak), yê Enqereyê Selim Hangül û yê Siwêrekê jî Zülküf Karahan bûye.

Piraniya nivîsên ku di rojnameyê de derketine bi tirkî bûne û ebada wê jî 40.8x28.7 cm bûye.

### Şarkın Sesi (Dengê Rojhilatê)

Ev rojname bi awayekî hefteyî li Stenbolê, di 18.05.1950'yî de dest bi weşana xwe kiriye. Rojname bi tirkî bûye û di bin navê rojnameyê de îbareya "Haftalık müstakil, siyasî, içtimai gazete" (Rojnameya hefteyî, siyasî civakî ya serbixwe" heye.

Xwedî û yê ku kar û barê nivîsaran bi rê ve biriye Samed Avşar bûye.

Di pirtûka Malmîsanij û Mahmûd Lewendî de, nayê gotin ku tevî hev çend hejmarê wê derketine. Tenê didine diyarkirin ku 6 hejmarê wê dîtine. Her wiha nivîskarê pirtûkê dadixuyînin ku, rojname bi awayekî erênî ji iktîdara Partiya Demokrat (Demokrat Partisi) behs kiriye.

Navê çend kesên ku di hejmara pêşîn de nivîsîne jî didin:





Samed Avşar, Diyarbekirî, Dadaşî, Yaşar Alhas, Alhasî, Cuma Hilmi Çallakıl, Nazım önen, Altuni, Cevdet Altun, Suphi Menteş, Dr. R. E., A. Ekrem Uğurlu, Behçet Direkçi, Gülhami Öztorun, M. Şevki Yazman.

Ebada rojnameyê jî ev e: 49,8x32 cm

M. RONAK

## Nexweşîna teqlîdê

DILBIXWÎN DARA



Şaîrê filistînî, ku yek ji mezintirîn şaîrên ereb ên hemdem tê hesibandin û wekî sembola wêjeya berxwedanê tê naskirin, Mehmûd Derwêş, li ser helbesta erebî û nivîskarên ereb wiha dibêje: "Ez naxwazim, berhemên we bixwînim – ji helbestvan û nivîskarên ereb re – ez xwe di we de nabînim. Wêneyên di dilê we de, ne wêneyên min in..."

Rewşa me ji rewşa nivîskarên ereb kambaxtir e. Em zeîftir in, ne xwediyê hêzeke xurt in ku bikaribin, li gorî xislet û motîvên neteweyî berheman biafirînin. Belkî ji ber ku me di dibistanên biyanî de xwendiye, bi zimanê wan em hînî xwendin û nivîsandinê bûne, bi zimanê wan em bûne nivîskar û bi zimanê wan me hest û daxwazên xwe anîne ziman. Û li dawiyê em xwe di rewşeke ne baş de dibînin. Em bi nexweşiya "teqlîdê" dikevin. Ne ji nava gelê xwe, em ji nava gelên din bûyer û mijarên berhemên xwe tînin.

Di nivîsên me de, wêneyên din têne dîtin. Gelê me nikare xwe di nava wan nivîsan de bibîne. Helbestên ku em dinivîsînin, bi êşa di hestiyên birîndaran de nahesin. Çîroka ku em dinivîsînin, tu dibêjî qey me ew ji swêdî, an jî, ji tirkî wergerandiye û tenê şûna navan û cih guhertiye. Me Kemal kiriye Silo. Deniz jî kiriye Gulê û em ji gel re çîrokan dinivîsînin. Xislet û motîvên neteweyî di nava berhemên me de nayên dîtin.

Me bi "teqlîdê" dest bi nivîsandinê kiriye, hîna jî me xwe ji wê nexweşiyê xelas nekiriye. Ne tenê di warê nivîsandinê de, jiyana me jî bûye teqlîd, em pênc mehan li cihekî bimînin, piştî wan pênc mehan tu êdî nikarî me nas bikî, meşa me jî tê guhertin, mixabin em nikarin baş teqlîd jî bikin. Teqlîdkirin jî pîşeyek e, şarezayiyekê dixwaze; zanebûn, qabiliyet û kapasîteyeke mezin dixwaze, eger ku tu ne xwediyê wê hêzê bî, tu caran tu nikarî bibî teqlîdvanekî jêhatî.

Ji bo çi em teqlîd dikin, ihtiyac çi ye? Gelo jêderk û çavkaniyên me miçiqîn, an jî di bîra me de av nemaye, wekî ku bapîrên me dibêjin..? Materyal û belge, bûyer û serpêhatiyên di nava me de, di destên me de, gelek in, dewlemendiyeke bêsînor heye, lê mixabin, em xwe nawestînin. Ji ber ku afirandin westabûnê dixwaze. Ji bo ku tu biafirînî, divê tu xwe biwestînî, eger tu xwe newestînî, wê tu her demê ji bîra xelkên din avê vexwî; rewşa me ev e. Hem di nivîsên me de, hem jî di stran, axaftin, mijûlbûn, gotûbêj, islûb û xîtabeta me de, em teqlîdeke mezin dibînin. Bêguman, mirov bi yên din re dide û distîne, divê dan–standin hebe, lê belê ji qanûna dan–standinê bêhtir, me ji xwe re kiriye adetek, me rê li pêşiya afirandina xwe girtiye.

Li stranên me guhdarî bikin, hûn dikarin ruhekî neteweyî di wan gewriyan de, di wan dengan de bibînin..? Em ji xwe direvin û berê xwe didin deriyên xelkê, bi me xweş tê.

Li dawiyê em çi dibînin? Romana kurdî nayê nivîsandin. Di çîrokên me de, karektera neteweyî nayê dîtin, tenê em navên qehreman û şexsiyetan diguhêrin. Em bi çavên biyaniyan li xwe dinêrin, bi wî çavî em li xaniyên şewitî, li çemên bi xwînê sorbûyî dinêrin. Em nivîskarên bi vî awayî ne, di helbestên me de jî ruh êdî zeîf bûye. Mirov di wan helbestan de wêneyên din dibîne.

Rastiyek heye; heya ku em xwe ji nexweşiya teqlîdê xelas nekin, emê tu caran nikaribin berhemeke ku bi hemû taybetiyên xwe kurdî be, binivîsînin. Emê nikaribin romaneke kurdî, helbesteke kurdî, straneke kurdî, heya gotineke kurdî jî, pêşkêş bikin. Ji bo ku em xwe ji teqlîdê xelas bikin jî, ji me tê xwestin ku em berî her tiştî ji bîra xwe ava zelal vexwin û xwe ji bo berhemên giranbuha biwestînin.

www.arsivakurdi.org



# Çeka gel

Di dema 12'yê rezbera 1980'yî de li Dîgorê, gundî li dolmîşê siwar in. Leşkerê roma reş digirin pêşiya wê. Zilaman tev ji dolmîşê tînin xwarê.

Piştî ku wan ji dolmîşê peya dikin, bi ser wan de diqîrin û tevan didin vezelandin.

Lê, ji rêwiyan yek venazele û paxav bi fermana serbazê roma reş nake. Serbaz bi ser de diqîre û dibêje:

– Bunların hepsi enayi mi ulan, sen niye yatmıyorsun? (Ma ev gişt ehmeq in, tu çima venazelî lawo?)

Rêwî lê vedigerîne:

– Hayır onlar enayi değil, onları yere yatıran enayidir. (Na, ew ne ehmeq in, ên ku wan dide vezelandin ehmeq in.)

Serbaz, li ser bersiva rêwî pir diqehire, demançeya xwe ji ber xwe derdixe, berdide ber lingên rêwî û jê re dibêje:

– Al bu devletin tabancasıdır. (Ha ji te re, ev demançeya dewletê ye.)

Rêwî xwe ranagire û demançeyê ji ber xwe derdixe, derbekê berî lingê serbaz dide û dibêje:

– Al bu da halkın silahıdır. (Ha ji te re, ev jî çeka gel e.)

CÎHAN ROJ
MÊRDÎN

# Misînê devgirtî

Rojekê, yekî Alûcî tê bajarê Mêrdînê. Wê ji xwe re alav û firaqan bikire. Zilam hebek safik e jî.

Lazimatiyê xwe dikire. Di nav firaqên wî de, misînek jî heye. Ji bajêr bi dûr dikevin, tevî hevalên xwe ber bi gund ve diçin.

Bi rê de hevalekî wî li misîn dinihêre û dibêje:

– Kuro, hey ehmeq, devê mîsînê te girtî ye. Dikandar mîsînê devgirtî daye te. De bibe bila dikandar misînekî dev–vekirî bide te. Gundî bi şûn ve vedigere, tê cem dikandar dibêje:

– Ma te misînê devgirtî daye min, kanî yekî dev–vekirî bide min.

Dikandar dinihêre ku gundî yekî safik e, jê re dibêje:

– Kanî 10 qurişên din, ezê misînê dev–vekirî bidim te.

Li ser vê gotinê gundî 10 qurişên din dide dikandar. Dikandar radihêje misîn, dibe hundir. Devê misîn vedike. Pişt re tîne dide yê gundî û jê re wiha dibêje:

– Ha ji te re misînê dev–vekirî.

METÎN EROL
MÊRDÎN

# Çiraya Xwedê

Zilamek bi rê de diçû; kera wî li ber bû û barê kera wî xwê bû.


Wî berê xwe da bazarê, bi rê de lê bû berf û baran. Bagerê kera wî kuşt; xwê şûşt; zilam bi awayekî jihalde ketî xwe avêt şikeftekê.

Birûskê vedida, dinya bûbû berf û bager. Zilam di şikeftê de lavayî Xwedê kir û got:

– Yarebî te ker kuşt, xwê şuşt û tu çirayê vêdixî li min jî digerî.


İSMET KAPLAN
RUHA

## XELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (17) XAÇEPIRSA



### Bersiva Xaçepirsê (15)


Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.
Xelata hejmara me ya 17'an kaseta **"Kardeş Türküler"** e.




***Jêrenot*:**
*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.*

Kesên ku xelata xaçepirsa 15'an Kaseta **Koma Amed "Agir û Mirov"** qezenc kirine: **Veysi Barış/Mardin,** Zeynep Berçem/Muş, **Ayten Ösün/Adana,** Faruk Kümet/Batman, **Abdurahman Çelik/İzmir,** Şakir Murad/Adana, **Mehmet Olağan/Ş.Urfa,** Seyda Basmacı/Ş.Urfa, **İsmet Korur/ Urfa,** Letif Kaya/Urfa


Xaçepirs (pirs):
İbadetxane
Şoreşgerekî tirk (wêne)
Şemsiye
Bersiva neyînî
Sembola zîvê
Çûkek
Cînavkek
Kûleya li Parîsê
Rojên taybet ên kurdan
Azîne
Navekî jinan
Şîrove
Sembola Neonê
Baneşanek
Şaxeke eskrîmê
Yaser .......
Piştgir, arikar
Darek
Beşeke demê
Televîzyon eke alman
Roberek li Rûsyayê
Jin
Nexweşîneke çermî
Darek
Yezdanekî Misrî
Gizêr
....'yê ewan
Pêmahî
Bi îngilîzî hewa
Sembola godolinyûmê
Heng
Gihanekek
Notayek
Teslîm



PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8

www.arsivakurdi.org

Du leşker ji ber ku tevlî mitînga aştiyê bûbûn hatine girtin.




# Ne însanên bêerd...

*Destpêk 8–9*

*Ev rewş wê çawa biguhere?*

– Ez dibêjim ku em derbasî demokrasiyê bibin. Pêşî, kurd jî tirk jî, bila derkevin ji çiya, kevir û kolanan qîr bikin, bibêjin "ez tirk im" an jî "ez kurd im". Piştî ku dilê xwe rihet kirin, wê bibînin ku tiştek naguhere bi vê. Hah. Wê çaxê emê werin dereceya sifirê. Vêga em di bin sifirê de ne.

Piştî wê emê rûnin, bifikirin "emê çi karî bikin, çawa bikin?" Em 65 milyon însan in, bi qasî norweciyan ku 5 milyon in, hilberînê nakin. Ev jî eyba muşterek a kurd û tirkan e. Ji ber ku me hê meseleya kurd û tirkbûnê hel nekiriye, ji vê rewşê fedî nakin. Li welatekî dema hilberîn tune be, ne nasnameya tirkan ne jî ya kurdan çêdibe. Hin tişt hene ku dema hebe bêqiymet e. Ji ber wê li Tirkiyeyê em girîngiyeke negatîf didin. Ji kurdan re ji bo ku mafê kurdbûna wan nayê dayîn, kurdbûn jî dibe meseleyeke girîng.

*Ev maf çima nayê dayîn?*

– Ji ber ku Komara Tirkiyeyê xwe bi tirs û xofan dorpêç kiriye. Demeke direj ji komunîstan tirsiya, ji olperestan ditirse, ji kurdan ditirse. Hema bibêje dixwaze dewletê bi awayekî sterîl bihêle. Vêga jî ditirse ku kurd wê erd parçe bikin. Ji ber van yekan jî, dewlet welatiyên xwe her tim ref bi ref ji xwe dûr dixe û ji xeynî kemalîstan jî kes nema wekî welatiyên dewletê.

Bi hezaran salan e ku însan vê dibêjin: "Em ji bo ax yanê erd, heta dawiyê canê xwe feda dikin." Ez jî dibêjim: "Ji bo ku ez însanan xelas bikim, ez heta dawiyê erd feda dikim." Ji erd jî girîngtir e însan. Mesela li Kalîforniyayê deşteke biçûk heye. Ew hilberîna ku li wê qesabaya biçûk tê kirin, ji hilberîna Tirkiyeyê ya salekê deh qat zêdetir e. Yanê însan dema bêerd bimîne, birçî namîne, dema bêaqil be birçî dimîne, mîna li Tirkiyeyê.

*Pirsgirêka kurdan tenê bi Tirkiyeyê re eleqedar e?*

– Tu dibêjî, dinya tevde piştgiriyê dide? Ez bawer nakim ku dinya piştgiriyê bide. Wisa difikirim ku dinyaya pêşveçûyî, Tirkiyeyeke dewlemend dixwaze. Çunkî dinyaya dewlemend malên bikalîte çêdike û dixwaze bifiroşe Tirkiyeyê. Heta kurd jî îdia dikin ku, erdê Başûrê Rojhilat gelekî dewlemend e, ez hîç ne di wê baweriyê de me. Li ser erdên Tirkiyeyê ne çemek heye, ne daristanek, ne jî madenek heye. Li dinyayê tu welat mîna Tirkiyeyê ji dinyayê re lava nake û li ber nagere da ku keda xwe bifiroşe wê. Ê ew jî nayên mêtinkariyê nakin. Naxwazin werin. Ev jî dişibe meseleya xizmetkara nedelal ku her tim gazinan dike, dibêje "Wê efendiyê ciwan ê malê, bikeve irza min." Lê belê ne xema wî efendiyî ye jî. Meseleya Tirkiyeyê jî eynî wisa ye.

Ha, dinya çima dixwaze em dewlemend bibin? Çunkî pêdiviya wê bi bazaran heye. Belkî berî 30 sal Amerîka vê yekê nedixwest, lê îro dixwaze. Îro Amerîka çima demokrasiyê dixwaze? Tev ji bo peydekirina bazaran e. Lê belê Tirkiye hê jî naxwaze bibe dewlemend. Hê jî li ser erd şer dike. Kuro erd yê we ye jixwe! Rûnin wekî însanan bixebitin. Tu kes naxebite. Jixwe îmkana xebatê jî zêde nîn e. Kanalên hilberînê jî xitimîne. Dinyaya pêşveçûyî her tim welatên dewlemend naxwaze, berê nedixwest. Berê tenê li hemberî Sovyetan mîna mustakbel goristaneke nukleer, em di destê xwe de digirtin. Da ku di şerekî de ji bo wan em 15 deqîqe bi kêrî wan werin.

Eger yên ku piştgiriyê dide vî şerî hebin, ew jî cîranên me ne. Ji ber ku cîranên me jî bi pêş ve naçin, naxwazin Tirkiye jî bi pêş ve here. Xêra wan welatan, ji xwe re jî nîn e.

*Madem wisa ye, ew avên ku li herêmê ne, çima dibe sebeba munaqeşeya Sûriye û Tirkiyeyê? Heta Emin Çölaşan jî dibêje ku, esas av ji rojava diçe rojhilatê Tirkiyeyê. Ev ne dijberiyek e?*

– Vêga ez ne pisporê vî karî me. Lê av dibe du beş, ji aliyê kategoriya xwe ve. Yek; ava ku aîdî wî welatî ye, lê di nav welatên din re jî dibore. Lê xwediyê wê avê, ew welat tê hesibandin. Yekî din jî; ava navneteweyî. Yanê ji gelek welatan derbas dibin. Lê ji ber ku ez ne pisporê vî karî me, tiştekî zêde nikarim bibêjim û avên me jî dikevin nav kîjan kategoriyê, nizanim.

Lê belê ez baweriya xwe bi Sûriyeyê, bi Iraqê, bi Îranê naynim. Ji ber ku ew bi dîktatoriyê tên rêvebirin. Ez baweriya xwe bi tu welatê ku bi dîktatoriyê tê rêvebirin, naynim. Eger Tirkiye jî bi dîktatoriyê were rêvebirin, ezê baweriya xwe bi Tirkiyeyê jî neynim. Li vê herêmê, baweriya min bi tu welatî nîn e. Çunkî ez baweriya xwe, ne bi dewletan, bi gelan tînim. Tiştê ku ez dixwazim; li ser rûyê dinyayê tu welat ne serbixwe be, her welat bi hev ve girêdayî bin û têkiliyan deynin. Bila têkilî ji navbera dewletan derkeve, di nav gelan de bila têkilî çêbin. Ha vêga, ez nizanim ewê çawa çêbe. Ev, vêga utopyayek e.

*Hûn hem dibêjin, bila civak xwestekên xwe bide der û bi rêveberan bide qebûlkirin, hem jî di nivîsên xwe de, hûn bedbîniyê nîşan didin. Wekî ku tu hêviya we ji gel nemabe. Îcar ev guherîna ku hûn behs dikin, ev gel wê çawa pêk bîne?*

– Ez îro di wê qanaetê de me ku, Tirkiye çeteyeke ji 65 milyon însanan avabûyî ye. Ez hîç ferqê naxim nav kurd û tirkan jî. Çima? Binêrin, li Tirkiyeyê her kes dixwaze bi dewletê re kar bike. Ev ne gelekî xerîb û sosret e? Gundî hilberînên xwe dixwazin bifiroşin dewletê û difiroşin jî. Gundî 32 roj dixebitin, geniman diçînin û ji sê qat zêdetirî buhaya dinyayê, difiroşin dewletê. Ev tiştekî mafdar e gelo? Yanê çi ferqa wan û Engin Civan ji hev heye? Her du jî ji mafên xwe zêdetir distînin. Yek bêhtir distîne, yekî din jî, ji yê din bêhtir distîne. Li gorî min, ferqa dizê biçûk û dizê mezin nîn e. Ji derveyî mafê xwe, dema însan pere bistîne, an diz e an jî parsek e.

Ha, gundî ne feqîr in, belê feqîr in. Lê dîsa jî, ji mafê xwe zêdetir pere distînin. Her kes bi wî rengî hereket dike û dewlet jî tê pereyan ji min û ji te berhev dike. Ji bo karkeran jî ev wisa ye. Karê ku divê 100 kes bixebitin, 300 kes wî karî dikin, wê çaxê ji wan 100 kes karker, 200 kes jî parsek in. Her wiha, karsaz jî bi wî rengî ne. Ev sîstem bi salan li Tirkiyeyê meşiya. Dewletê pere çap kirin, enflasyon teqiya û me pere di nav xwe de par kirin. Ji ber vî şerî jî, êdî pereyê dewletê neman. Yanê behr ziwa bû.

Ji îro pê ve êdî taleb û xwestekên civakê cara yekemîn wê xwe bide der. Çunkî êdî pereyê belaş nema. Maliyeya dewletê hilweşiya. Dewlet nikare ji memûrên xwe re meaşan jî peyda bike. Êdî gelê tirk mîna ku serê xwe li dîwêr bide, wê serê xwe li rastiyê, bi leza 160 km. bide û vê rastiyê bibîne; ev sîstem xelas bû. Vê rastiyê wê her kes bibîne. Karsaz jî, karker jî, rewşenbîr jî, kurd jî, tirk jî wê bibînin. Ha, êdî em dibînin jî. Ji ber wê yekê, divê pêşî ev şer bisekine, em derbasî demokrasiyê bibin û meseleyên aslî yên jiyanê bibînin.


WELAT

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

**Li ser navê**
**Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına**
**Xwedî (Sahibi)**
CELALETTİN YÖYLER

..............

**Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni)**
MEHMET GEMSİZ

**Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu)**
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

..............

**Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)**
DÜZGÜN DENİZ

..............

**Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü)**
TAHİR ELDEMİR

..............

**NAVNÎŞAN**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 251 90 13

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.


**BELAVKIRIN**
Birleşik Basın Dağıtım (BBD)


**NÛNERÎTIYÊN ME**
(Temsilciliklerimiz)


**Nimînendeyê Giştî yê Ewrûpayê:**
Mazhar Günbat
**Suriye:**
Jan Dost
**Berlin:**
Silêman Sido
49–30–69002695
**Hannover:**
Selîm Biçûk
49–5721–81360
**Munchen:**
Mahmut Gergerli
49–871–670884
**Atîna:**
Ferhan Zêbarî
30–13634905
**Bruksel:**
Medenî Ferho
32–02–466037
**Stockholm**
Robîn Rewşen
46–8–7510564
**Badenwurttenberg**
A. Rahim Ayaz
49 75 45 91 10 42

# Şûrê melkemotê kulê têrxwîn nedibû...

**Ew kesên ku bihiş û îradeyên xwe di kûrahiya şewat û êş û janê re derbas dibin, serê xwe datînin ser balgîva mirinê, beriya ku bikevin wê xewa giran, çi tê hişê wan, di kela dilê wan de çi diqewime, çi derbas dibe an jî dibin?..**


İbrahim Kaypakkaya


Haki Karer


Halil Çavgun

Bi zanîn û xwestek serî direjkirina bin şûrê melkemot tiştekî çawa be gelo?.. Ew kesên ku bihiş û îradeyên xwe di kûrahiya şewat û êş û janê re derbas dibin, serê xwe datînin ser balgîva mirinê, beriya ku bikevin wê xewa giran, çi tê hişê wan, di kela dilê wan de çi diqewime, çi derbas dibe an jî dibin?..

Dema destên xwe direjî destê melkemot dikin, dizanin ku ew çavên wan wê êdî hew çavên kesî bibînin, hew tîrêjên rojê, pêlên avê, şekerkenê zarokakekî/ê du salî bibînin... Û wê guhên wan, hew li straneke dengbêjekî awazxweş guhdarî bikin... Lê dîsa jî, ew destê xwe direj dikin, datînin nav destê melkemot ên ji agir... Çi rewş e, çi fikr û raman e, çi hêz û pêwistî ne gelo, ku vê yekê bi wan didine kirin? Û ji bo çi di civakê de ev kes kêm in, lê hemû pêşveçûn li ser milên wan çêdibin?..

İbrahim Kaypakkaya, xortekî xwenda û rê li pêşiyê vekirî... Bo çi rabe, ji bajarê Çorumê were li ser çiyayên Dêrsimê birçî, bêxew di serma û seqemê de, di berf û bahozê de ji bo xweşiya reben û belengazan, ji bo rizgariya karkeran xebatê bike û dema Üsteğmen Fehmi Altınbilek di rengê şûrê melkemot de were li ser serê wî bisekine, ew serî bide, lê sir nede?..

Haki Karer xortekî tirk bû. Ji bajarê Orduyê û ne ji malbateke feqîr û reben, ji malbateke hal û wext xweş bû... Dev ji hemû 'xweşiyan' berda, wî jî hat xwe avêt nav pêlên agir û jana bindestiya kurdan... Ne şev jê re şev, ne roj jê re roj û gelek caran birçî, gelek caran bêxew dest bi kar û xebatê kir... Û ji bo kurdan, lê di pêşiya hemû hevalên xwe yên kurd de, berî her kesî wî serê xwe direjî bin şûr kir... Di 18'yê gulana 1977'an de, li bajarê Entabê serê xwe danî wê xewa giran...

Û di 19'yê gulana 1978'an de jî, îcar li ser şopa Haki, Halil Çavgun serê xwe danî...

Reştariya Zîndana Amedê bi sê darikên niftikê tenê nediçiriya, ronahî nedibû... Agirekî bêhtir mezin lazim bû... Li wê derê, di wê reştariyê de, şûrê melkemotê kulê bi canekî, du canan têrxwîn nedibû... Bi nalîn û êş û jana girtiyan a ku ji bin îşkence û lêdanê dipekiya, aş nedibû... Devê wî yê ji hev bûyî bêhtir xwîn dixwest, bêhtir vedana birînên kûr, bêmefer dixwest...

Û di 17'yê gulana 1982'an de çar can û çar dilên bişewat, bi agirekî bilind bersiva melkemot û reştariya Zîndana Amedê dan... Ferhat Kurtay, Eşref Anyık, Necmi Öner û Mahmut Zengin di wê şevtariya biharê de, xwe bi hev ve girêdan, tîner bi ser xwe de kirin û agir bi xwe ve dan...


Dema hevalên wan xwestin bitefînin, gelo çi hêz bû ku "Na, netefînin! Agir geş bikin!.." bi wan dida gotin?.. Ewê ku ji pêtên agir zêdetir ew dişewitandin, çi bûn gelo?..


RAHMİ BATUR


## *Şeva 17'ê gulanê*


*Wê şevê,*
*bajar di xewnê de,*
*çivîk di hêlînê de,*
*sebî di hembêza dayikên xwe de...*
*û çar kes,*
*di agirê evînê de bûn.*
*Wê şevê*
*Girtî şilf û tazî, di şikefta tirsê de bûn.*
*Çar egîdên ji êgir*
*ji dil qîriyan:*
*–Avê lê nekin, avê lê nekin!*
*–Êgir geş bikin, êgir geş bikin!*
*Û ji bo ku bigihêjin Ahuramazda*
*17'ê Gulanê serê sibê,*
*derbasî jiyana ebedî bûn*
*Zarokên devliken ên dîrokê,*
*Mêrxasên gelê me,*
*Ferhat qîriya:*
*–Avê lê nekin, avê lê nekin!*
*–Agir geş bikin, agir geş bikin!*
*Di nav êgir de,*
*Çar canên ciwan,*
*Dil bi şewat, mîna êgi*
*dişewite ha dişewite.*
*Agirê geş di bedenan de,*
*dişewitîne bi saxîtî*
*FERHAT*
*NECMÎ*
*MAHMÛT*
*EŞREF*

*M. Sait Üçlü (1990–Gitîgeha Aydınê)*
*Werger: Salihê Kevirbirî*


Ferhat Kurtay


Necmi Öner


Eşref Anyık


Mahmut Zengin

www.arsivakurdi.org